Danasîn # Analîz # Rexne

# HELWEST

Kovara Kulturî û Lîteraturî

## *FOLKLOR (ZANYARÎYA GEL)*

KULTURA DEMOKRASÎYÊ




DEMOKRASÎ Û WEKHEVÎ

## GOVENDÊN GELÊRÎ

Helwest ☞ Hejmar / No :10 **** - Bihar - 1998

www.arsivakurdi.org

HELWEST
**Kovara Kulturî û Lîteratur î**

Utgivare
Moderna Kultur Förlaget

Xwedî
Weşanên Çanda Nûjen

Ansvarîg / Berpirsiyar
Birêvebirê Kovarê
Lokman Polat

Hejmar : 10

Sal : - Bihar - 1998

Çap : Baran Tryckerî

Abonetî : Salek - 150 Kr.

Derveyê Swêdê : 50 $

Postgîro : 9 13 31 - 9

ISSN - 1400 - 9404

Navnîşan / Adres
Tensta Alle 43 - 2tr.
163 64 Spanga - Sweden

Înternet E - Maîl
Sertac - @ hotmaîl. Com

Wêneya Bergê

Cejna Newrozê
( Govenda Kurdan)

# PÊŞKÊŞÎ




**Lokman Polat**

Xwendevanên Hêja!
Hejmara çûyî; ku me li ser zîndana Amedê amade kiribû ji alî xwendevanan ve gelek bi nirx hate pejirandin. Ji xwendevanan gelek nameyên pîrozbahiyê ji kovarê re hatin. Em ji bo vê hezgîriyê ji xwendevanan re sipas dikin. Wan bi nameyên xwe yên bi qîmet me şad kirin. Nameyên weha pêwîst in. Ruhê hezkirin û hîsdariya nameyan alîkariya herî mezin e ji bo birêvebir û nivîskarên kovarê. Dibe rêç û rêbaz ji bo kovarê.
Di vê hejmarê de me giranî da ser kultura demokrasiyê û folklora Kurdan. Li ser folklor, govenda Kurdan nivîsên balkêş hene. Divê xwendevan jî li ser van babetan dîtin û pêşniyazên xwe binivîsin û ji kovarê re bişînin ku em biweşînin.
Daxwaza me ew e ku xwendevanên Kurd bibin aboneyên kovarê. Divê hemû komeleyên kulturî bibin aboneyên kovarên kulturî. Lê çi heyfe ku nabin. Bi taybetî jî komeleyên kulturî yên li Almanyayê kovarên xwerû bi Kurdî yên kulturî nakirin, anku nabin aboneyên kovaran. Em balkêşiya wan dikşînin ku ew ji niha pêve bibin aboneyên kovarên Kurdî.
Di vê hejmarê de hinek nivîs hene ku di hejmarên din de jî dê dom bikin. Me nexwest ku nivîsên dirêj di carek de biweşînin û kovarê bi nivîsên dirêj bifetisînin. Di her hejmara kovarê de çiqas nivîsên cûre, pirreng û pirdeng hebin, çiqas babetên cûda, mijarên rengoreng hebin kovarê ewqas dewlemend dikin. ji bo kovarek rengîn û zengîn weşandina mijarên cûrbecûr pêwîst e. Kovara Helwest dê vê pêwîstiyê bîne cîh.
Hetanî hejmara bê hûn bimînin di xweşiyê de.
Li benda hejmara 11'an bin!

www.arsivakurd.org

# NAMEYÊN XWENDEVANAN




Li ser guhertina şiklê kovara Helwest'ê ji me re hinek name hatin. Gelek xwendevanan jî dîtinên xwe di telefonê de diyar kirin û me pîroz kirin. Em li ser vê eleqa germ a xwendevanan dilşad bûn. Em ji wan re gelek spas dikin ku vê eleqa germ nîşan dan.

Nivîskarên ku di kovara Helwestê de nivîs dinivîsin, wan jî dîtinên xwe pêşkêşê me kirin. Wan jî guhertin û pêşketinên kovarê bi nirx şîrove kirin. Em ji van nivîskarên hêja re jî spas dikin û berdewamiya nivîsên wan dixwazin.

Li ser guhertina şiklê kovarê xwendevanekî me weha dibêje :
"Kovar bi vê şiklê xwe yê nûh hin xweşiktir bûye. Ji alî estetîkê ve jî weha hîn baştir e."

Xwendevanekî din jî dibêje : "Ev hejmara Helwest'ê ya nûh navûdeng daye. Gelek mirovên ku xwendine kovarê baş ecibandine. Ji alî naveroka xwe ve jî, ev hejmar têkûz e, dewlemend e. Nivîsên gelek balkêş di vê hejmarê de hene. Helwest her diçe dikemile."

Xwendevanê kovara Helwest'ê S. S. Dilpolo ji me re nameyek û nivîsek şiyandiye. Ji bo ku di vê hejmarê de cîh tunebû, em nivîsa wî di hejmara 11'an de diweşînin. Nameya wî jî ji bo ku dirêj bû em beşek jê li jêr diweşînin, temamê nameyê jî di hejmara 11'an de diweşînin.

Em li jêr nameya S. S. Dilpolo bi kurtahî pêşkêşê xwendevanan dikin.

## "HELWEST BI NAVEROKA XWE DEWLEMEND E"

Helwest divê helwesta xwe ya misyoneriya "çand, huner û wêjeyê" berdewam bike.

Kovara Helwest bi naveroka xwe diyar dike ku misyoneriya "çand, huner û wêjeyê" niha daniye ser milên xwe. Her çawa pêwîstiya Kurdan bi misyoneriyeke ramyarî ya di pêleya blind û navnetewî heye, her weha jî, pêwîstiya Kurdan bi kovar/rojnameyên "çand, huner û wêje" , Bijîjk, Zanîst - Teknîk, kovar û pirtûkên zarokan û ta bigre agahdariya cinsî jî. Hingê dê sosyalîteya Kurd berztir be û ronaktir be. Ew nakokîyên di mejiyê mirov de hene zelaltir dibin.
Çapemenî di hişyarkirinê de, di pêleya bilind de ye, ango ronakkirin, bi rêkkirin û birêxistinkirina civakê di bin gemên çapemeniyê de ne. Çapemenî gelekî dewlemend be, ew wate ye ku rewşenbîrên wê netewê pirr in. Heger rewşenbîrên gelekî kêm bin, zanîst û sosyalîteya wî gelî jî daketiye, zû berz nabe, afirîneriyên nû dernayên; xwe li dora kevneşopî û çanda bav û kalên xwe yên berî hezar salan digirin. Ev jî dibe birîneke bê derman a di navbera nûjenî û kevneperestî, zanîsta pêşketî û zanîsta paştemayî. Divê mirov tim bi dem û zanîstê re gavên xwe biavêje.
Min li ser "Kovara Helwest" hejmarên kevin û nû çavgerîneke kir û ez çend nêrînên xwe dinivîsînim. (Em nêrînên S. S. Dilpolo bi temamî di hejmara bê de diweşînin.)

www.arsivakurd.org

# 100 Salîya Rojnameya Kurdistan Pîroz Be

K. Helwest

Sala 1998'an pîrozbahiya sedsaliya rojnamevanîya Kurdî ye. Divê salê de hemû weşanên Kurdan sedsaliya weşandina rojnameya Kurdî ya pêşîn KURDISTAN pîroz dikin. Weşanvanên Kurd 1998'an "Sala Rojnamevanîya Kurd" qebûl dikin. Rewşenbîrê Kurd Mîqdad Mîthet Bedirxan di 22'ê Nîsana 1898'an de li Misirê rojnameya Kurdistantan diweşîne. Paşê Evdirehman Bedirxan weşandina Kurdistan'ê li Ewropayê domandîye. M. Emîn Bozarslan li ser rojnameya Kurdistan gelek xebitîbû û wê wergerandibû tîpên Latînî û ji nû ve çap kiribû.
Rojnameya Kurdistan li gorî dema xwe, ji alî naveroka xwe ve gelek dewlemend bû. Li ser çand û edebiyata Kurdî, li ser destanên dîrokî, li ser zimanê Kurdî, li ser dîroka Kurd û Kurdistanê gelek nivîs têde hatine weşandinê. Rojnameya Kurdistan di serî de xwerû bi Kurdî hatiye weşandinê. Lê piştî hejmara 4'an nivîsên tirkî jî weşandine.

Di rojnameya Kurdistan de li ser biratiya gelê Kurd û gelê ermenî jî hatiye seknandin. Zilm û zordariya Dewleta Osmanîyan teşîr kiriye, li dij dagirkeriyê rawestiyaye. Rojnameyê girîngîyek girahbiha daye zanîna dîrokî jî.
Di kovara Helwest hejmara 8'an de li ser pêwîstiya kovarek dîrokî ya Kurdan nivîsek heye. Nivîsek gelek balkêş e. Lê balkêşiya wê ya girîng ev e ku 100 sal berê li ser eynê mijarê di rojnameya Kurdistan hejmara 8'an de jî nivîsek weha heye. Li ser girîngiya nivîs û lêkolînên dîrokî di rojnameya Kurdistan de xwediyê rojnameyê weha dibêje : "Ez dizanim Kurd di derheqê dîroka Kurdistanê de xwediyê zanînê nîn in. Ji bo vê di her hejmarê de, ez dê di derbarê Kurdistanê û bapîrê Kurdan de nivîs binivîsim."




Rojnameya Kurdistan bi tîpên Erebî

Nivîskarê rojnameya Kurdistan Omer Kadî jî dibêje: "Armanca rojnameya me ya pîroz yek jê jî ev e; ku em dîroka Kurdan, zanîstiya Kurdan û edebiyata Kurdan bigihişînin miletên cîhanê."
Di rojnameya Kurdistanê de li ser dîroka Mîrên Cizîra Botan, li ser Selhadînê Eyûbî û li ser gelek bûyerên dîrokî nivîs hatine weşandinê.
Wek ku birêz Bozarslan jî dibêje: "100 saliya rojnamevaniya Kurd ji bo me Kurdan bûyereke gelek girîng e. Di dîroka hemî neteweyan da bûyerên weha cîyên giring digirin, bi şênayî û civînan tên pîrozkirin." Em jî hêvî dikin ku "100 salîya rojnamevanîya Kurd bi konferansan, bi semîneran, bi cîvînên çandeyî bê bîranîn û bê pîrozkirin."

www.arsivakurd.org

# 100 Saliya Rojnamegerîya Kurdî (1898 - 1998)

Mahmûd Lewendî

Rojnama pêşî "Kurdistan" e, li Qahîreyê di 22'ê Nîsana 1898'an de ji alî Mîqdad Mîdhet Bedirxan ve hatiye derxistin. 75 sal piştî derketina vê rojnameyê, di 1973'an de li Kurdistana Iraqê, 22'yê Nîsanê wek Roja Rojnamegerîya Kurdî hat qebûlkirin û ji wê rojê de ye her sal ev roj tê pîrozkirin.

Îsal jî 100 salîya rojnama Kurdistanê ye, bi vê wesîleyê em îstatîstîkeke kurt a derheqê kovar û rojnameyên Kurdan de radixin ber çavan.

Heta nuha bi qasî ku me tespît kirîye:

— **1036** kovar, rojname û bultenên Kurdan derketine.
— Nêzî **700** hebê wan ji alî partî û rêxistinan ve hatine derxistin.
— **270** heb ji wan tenê bi Kurdî ne (piranî bi Soranî, paşê Kurmancî û Dimilî), yên din bi Tirkî, Erebî, Farisî ne, hinek ji wan jî nîva - nîv in (Kurdî-Tirkî, Erebî-Kurdî û hwd.). Nêzî 35 kovar û rojname jî bi zimanên din derketine, wek: Îng., Alm., Swêdî, Yunanî, Rusî, Fînî û hwd.
— Ji van kovar û rojnameyan nêzî 600 hebên wan îllegal derketine.
— Kovara herî stûr (qalind) Kovara Korî Zanyarî Kurd (No:1-2) ye ku di 1974'an de li Kurdistana Iraqê derketiye û ev hejmar 976 rûpel e.
— Kovara herî kêmrûpel kovara Belavok e ku li Swêdê derdiket, hejmarek wê 1 rûpel e.
— Piraniya kovar û rojnameyên ku ji teref dewletê hatine girtin yên Kurdistana Tirkiyê ne. Hema hema çi bigre ji % 96'ê wan ji teref dewletê hatine girtin, an jî derheqê wan de mahkeme vebûne.

— Piranîya rojnamevanên Kurd li Kurdistana Bakur ji teref dewletê ve hatine kuştin.

**Li gor welatan**
— Iraq û Kurdistana Iraqê : 378
— Tirkiyê û Kurdistana Tirkiyê : 181
— Îran û Kurdistana Îranê : 74
— Surîye û Kurdistana Surîyê : 83

— Lubnan : 21 - Almanya : 68 - Swêd : 98 - USA : 16 – Canada : 9 – Fransa : 27 – Yunan : 9 – Sovyet : 17 – Pakistan : 7 – Finland : 4 – Danmark : 7 – Bulgaristan : 5 – Urdun : 5 – Romanya : 4 – Holland : 7 – England : 11 – Belçîka : 5 – Norveç : 7 – Misir : 11 – Çekoslovakya : 5 – Awistirya : 7


— 44 heb jî ciyê derketina wan nediyar e.

Ji van kovar û rojnameyan :
8 heb ji bo zarokan e
6 heb yên mîzahî ne
7 heb yên jinan e
17 heb îslamî
7 heb di zîndanan de derketine (li Kurdistana Tirkiyê)
2 heb yên xortan
1 magazîn (navê wê Rengîn e.)

# DI KURDISTANÊ DE KULTURA TEKSTÎLÊ

X. ÛSO


Di civakekê de kultura hilberînê, li gorî pêşveçûna hêzên hilberînê, tevlaya berkêşanê û di pêvajoya dîrokê de civîna tecrûbên wê civakê dikeve formekê. Jêdera bawerî, hunermendî û tevaya kulturê, estetîk û bedewîya vana, jîyan û pêwendîyên civakê yên aborî, civakî û dîrokî ne. Di hundir hilberîna pîşeyî de, estetîk û bedewîya temamê kultura wê civakê bi hev tê kelandin û di hundir hev tê neqşandin.



Gelê Kurd, yek ji wan gelên Mezopotamya yên herî kevn û cîvarbûyî ne. Loma di her warî de xwedîyê mîrat û kevneşopîya medenîyeta Mezopotamya ya bi hezar salan ku di kurahîya dîrokê re hetanî îro dawerivî ye. Loma di her qada kultura Kurdistanê de, ev şop û nîşanên dîrokî yên kevnar bi hêsanî têt dîtin. Li Kurdistanê, kêsim û metoda hilberînê, pergal û ambûrên hilberînê, form û motîfên ku berhemên hunerî dixemilîne, xwedîyê teybetîyên dîrokî ne.

Ji bo ku kolonyalîstan aborîya Kurdistanê mîna aborîyek talanê bikar anîn û destûr nedan ku li Kurdistanê endustrîya kapîtalîst geş bibe, bûn sedem ku bermayîyên aborî û endustrîya berî kapîtalîzmê hetanî îro hebûna xwe berdewam bike. Lê tevlî vêna, em baş dizanin ku îro bi her awayî bazara kapîtalîst li Kurdistanê serwer e. Berî ku mazata sermiyandarî li Kurdistanê serwer bibe û malên endustrîya tekstîlê ya malê, li gorî pêdivîyên wê malê hilberîn dikir. Lê bermayîyên vê endustrîya kevnar ku maye, îro bi armanca

mazata kapîtalîst û bi piranî hinek jî mîna berhemên turîstîk dihilberîne. Em vegerin ser sedemên çêbûna vê endustrîyê û berhemên wê:



Di dîroka mirovahîyê de, di pêvajoya şivanî û cotkarîyê de, li gorî pêdivîyên xwe cîvakê, berhimandina tekstîlê jî li şaxê hilberîna xwe zêde kir. Ji bo mirov xwe ji sermê an germê biparêze, jê re şal û şepik, mîntan, kiras an gorê rîs pêwîst bû; koçer jî bo biçin zozan û wargehan ji wan re konê mû ku wan ji ba û baranê, sar û sermê biparêze pêwîst bû; ji bo li mal li ser rûnên û rakevin an di xwe werkin xalî û xalîçe, merş (astir) , tej û kulav lazim bû; ji bo ku zad û qût, girgaf û feraqên xwe tê de biparêzin an pê bar bikin, pêwîstî bi têr, ferd, tûr, eba û werîsan hebû; ji bo ser kûlînan, an pêş taq, nivînan, sifran û bin xwarinê berr pêwîst bû. Ji bo hûnandin û raçandina mû û hirîyê pêwîstî bi pergal û ambûrên bi hezar salan hatîye keşifkirin û ketîye formek vebirî û bi tecrûba xebitandina wan hebû.

Baş tê zanîn ku di her gund, bajar û kolanên Kurdistanê de, gelek malên Kurd hîna jî xwedîyê pergal û dezgehên culhdarî û lebûdîyê ne; xwedîyê şehê mû, teşî û denê boyaxên xwezayî ne. Gelek malên Kurd kut û dîrekên tevnê wan li ser kulînên wan di bin nivînan de veşartî ne. Ji xwe parçên tevnê piranî ji daran çêdibe; ji kut, stûn, gurd, sêpî, bevş, masûr, pîj û şûrik çêdibe. Tenê kerkît û kêrik, an sîxik, derzî û şûjin hesîn e.

Her jin an pîra Kurd ji zarotîya xwe de hunermend û pêşekarek xwezayî ye. Her qîz û bûka Kurd jî şagirtek hunermendîyê ye di hundir mala Kurd de. Her qîz û bûk, ji bo cêz û xemla mala xwe, karê wan yek jî çêkirina tentene û neqşên cûre cûre û renga reng in. Di berr û xalîçên xwe de û di neqşên ser caw de jinên Kurd rengên zînde bi kar tînin. Bi motîfên geometrîk, bi wêneyên gul û kulîlkan, teyr û teban berhemên xwe bi ahenga rengan dineqişînin û dixemilînin. Lê di nav van neqşan de wêneyên pîrozwer, mîna ro, teyrê tawis û şahmaran di giranîyê de ne. Hunermendîya pîşeyî, di jîyana gelê Kurd de ewqas cîhekî girîng disten ku dibû sedemê yarî, pesn û metelokan. Keç û jinek bêkêr an jî karekî bi huner re nebe, bi metelokek werê tê şermezarkirin:
"Ji tevn û teşîyê re na weleh, ji masûran re hageleh!"

www.arsivakurdi.org

# BERSÎVA REXNEYA AZADIYA WELAT
# - 1 -

## Kovara HELWEST

Di rojnameya hefteyî ya Azadiya Welat hejmara 109an de bi îmzeya Samî Berbang, di derheqê kovara Helwestê û hin nivîskarên wê de heqaretnameyek derçû. Ev heqaretname bi sernivîsa, "Nimûneyeke karê kesane: Kovara Helwest " bû.

Samî dibêje "Helwest navekî giran, warekî wêran e."
"Navekî giran, warekî wêran!" Ev çi heqareta mezin e! Ev çi terbiye ye!

Bi rastî em mereq dikin, gelo Samî li ser hişê xwe bû dema ku ew heqaretname nivîsand? Ew çi zane ku birêvebirê kovara Helwestê Lokman Polat serbixwe ye? Tu bi wî re peyivîyî? Wî li kuderê gotiye û di kuderê de nivîsîye ku ew miroveki serbixweye? Wî hertim wek miroveki sosyalîst û partîlî kar kiriye. Lê Samî Berbang kî ye? Divê em wî nas bikin. Belkî bi rastî insanekî pir alim be, pîspor be, zimanzan be û serokhêzekî mezin be. Heger em wî kesekî wisa bizanibin, em ê jî heqaretên wî wek şîret qebûl bikin û ji gotinên wî dernekevin(!).

"Navekî giran, warekî wêran!"
Samî Berbang beriya ku çewtiyek wisa bikira, dikarîbû têkilî bi rêvebirê kovara Helwestê re daniya û di derheqê weşana wê de bi hinek dîtinê xwe yên şehane alîkarî bikira. Di kovara me de jî dibe ku car carnan em hinek şaşiyên gramerî û hwd. bikin. Lê ev yek gelo wî heqî dide ên wek Samî ku vê heqareta mezin,"Navekî giran, warekî wêran!" li me bikin û şûrê qetilê bi ser me de bihejînin?

Helwest bersivek e. Heger Helwestê bersiva hewcedariyan nedaba, me Helwest dernedixist. Helwestê wisa bersiva hewcedariyan daye ku ne Samî Berbang û ne jî hevalên wî bikaribin qala van hewcedariyan bikin. Di xwezayê û di jiyana cîvakan de valahî nayê qebûlkirin. Heger vê valahiyê Samî Berbang û hevalên xwe tijî nekin, dê hinekî din derkevin û vê valahiyê tijî bikin. Kovara Helwestê ji ber pêwîstiya valahiyan derketiye. Kovara Helwest bi karê kesane dernakeve, bi karê kolektîf derdikeve. Tê de keda gelek ronakbîrên hêja û mirovên dilpak heye.

"Navekî giran, warekî wêran!" Ji vê re ne zimanê rexnegiriyê, zimanê sikakê-zimanê kuçan- tê gotin. Samî xwe kiriye dadger, rexnegirê herî mezin û bi zimanekî bêçap êrîşî rêvebir û nivîskarên Helwestê kiriye. Ew çawa wî heqî di xwe de dibîne em meraq dikin!

"Navekî giran, warekî wêran!"
Digel ku me aramanca derxistina kovara Helwestê di hejmara yekem de, bi navê sernivîsa "Helwesta Rexnegiriyê"nivîsîbû, Samî hê jî ji Helwestê fam nekiriye. Helwest xwedî zihniyeteke sosyalîst e. Di vê kovarê de hemû welatparêzên kurd dê bikaribin binivîsînin. Mêjiyê me ne mejiyekî monoteyîst e; xwe bi ramanên totalîter av nade. Ew zihniyeta yek partî, yek rojname, yek kovara û hwd. ne sosyalîst e. Helwest nimûneyek ji bo wan grûb û rêxistinên ku di kovar û rojnameyên xwe de ji dîtinên xwe pê ve rê nadin tu dîtinên din. Te fam kir?

HEVPEYVÎN

bi

Cemal Batun re

HEVPEYVÎN

# EM KURD DIVÊ QIYMETÊ BIDIN BERHEMÊN XWE

## Kovara Helwest

*Pirs 1- Ji kerema xwe, tu dikarî behsa xwe û rojnamevaniya xwe ji me re bikî, Tu ji bo çi û ji kî re dinivîsî?*

*Cemal Batun - Bersîv:* Xebata min a rojnamevaniyê hîn di salên xwendina min a uniwersiteyê de destpêkir. Ji xwe min fakulteya rojnamevaniyê xwend û bi awayek tebîî hîn wekî xwendevan min hewl dida ku ez pratîka xwendina xwe bikim. Di vê çarçoweyê de, ji ber ku min xwendina xwe ya bilind li Bulgaristanê kir, nivîsên min ên ewil jî di çapemeniye bulgarî de hatine çapkirin. Di navbera sala 1986-1988'de jî min di rojnameyek rojane ya bulgarî de kar kir, ku yek ji mezintirîn rojnameyên bulgarî bû. Di vê rojnameyê û di çend rojname û kovarên bulgarî de, di vê demê de min zêdetirî 200 meqeleyan nivîsî. Herweha dîsa di vê demê de min çend nivîs ji Kurdistan Press re rêkirin, ku tê de hatin çapkirin. Di navbera salên 1990-1994'an de jî min di redaksiyona Berbangê de cîh girt. Dîsa di vê demê de min di redaksiyona kovara Demokrat de xebat kir. Piştî sala 1994'an min ji kovara Hevdem re nivîsî ya ku li Tirkiyê hate weşandin. Niha jî bi çend hevalan re, em di hewldana çapkirina kovarek lêkolînî û debatê ne, ya ku bi navê "Însiyatîf" dê bikeve nav jiyana çapemenî ya Kurd de.

Di van hemû xebatan de jî, wekî rojnamevanekî min hewl da ye, ku ez pirsgirekên civat û rastiya Kurd bînim zimên. Ez erkek mezin li ser milê rojnamevaniya Kurd dibînim, ku ew bikaribe trajediyên sosyal, strukturî, psîkolojîk, aborî û hwd. ku Kurd dijin jî bikole, sedemên van krîzan diyar bike û ji bo çareyan serî li pîsporan bide. Ez dezgehên ragihandinê di warê reabîlîtasyon û pêşketina civakî de wekî dezgehên gelek girîng dizanim. Kovar, rojname, radyo û TV'ên Kurdî divê bibin platforma van xalên min diyarkirî, ku bikaribin di pêşketina civakî ya Kurd de rolek pozîtîv bilîzin.

*Pirs 2- Tu di van salên derveyî welêt de çi hîn bûyî, te çi stand û çi wenda kir, tu dilşa yî, dilşa ninî?*

*Cemal Batun - Bersîv:* Ev bû 16 salin ku ez li derveyî welêt im. Ango nêzîkî nîvê emrê min li "xerîbiyê" derbas bû. Ez çi hîn bûm? Ya yekem min xwendina xwe ya bilind li derveyî welêt kir. Lê li gel vê jî, mirov bi jiyan, kultur, edet, helwêstên civakî yên vî welatî re jî kete nav hev. Piştî wê ez hatim Swêdê ango welatek sêyêm - her tişt jî ji nu ve destpêkir. Vê carê mirov normên jiyanê, kulturî, edetî, struktura civakî, aborî û hwd. ên Swêdê fêr bû. Bêguman ev yek dewlemendiyek mezin e. Ji sedî sed e, ku jiyana min a li derveyî welêt di formkirin ango şiklstandina dîtin, ra û helwêstên min de rolek xwe ya bingehîn heye.

Li gel vê, ez dizanim ku min gelek tişt jî wenda kirin. Bi taybetî di warên hîssî de, ez brîndar im. Min nedît, bê çawa xwişk û brayê min mezin bûn, çawa dê û bavê min pîr dibin, çawa darên xewşeya me bilind û hêşîn dibin, çawa zarokên min di nav newal û zozanên Kurdistanê de baz didin, çawa kal û pîrka wan bi wan dilşa dibin? Dibe ku ev gotinê min gelek hîssî werin, lê bi rastî ez gelek bêriya van yekan dikim.

www.arsivakurd.org

Vêca ez dikarim bibêjim, ez ne dilşa me. Xwezî me jî wekî hemwelatiyekî her welatî, bikara serbest di nav xaka xwe de bijin, da ev kul û derdên kurr em ne xwara.

*Pirs 3- Tu rewşa edebiyata Kurdî ya nivîskî çawa dibînî? Başî û kêmasî çi ne û ji bo çêtirkirinê çi dive?*

*Cemal Batun - Bersîv:* Ez rewşa edebiyata Kurdî ya nivîskî, rewşek trajîk dibînim. Mixabin ku ez vê gotinê bikar tînim, lê ez welê pê dihisim. Ya yekem rêza edebiyata Kurdî nayê girtin. Gava ez vê yekê dibêjim, ez bi giştî dibêjim. Bêguman mirovên ku rêz û qiymetê didin edebiyata Kurdî jî hene, lê kêm in, lê bi tiliyan dikarin bêne hijmartin. Ev trajediyek e. Girîngtirin tişt guherandina vê helwêsta negatîf e. Em Kurd divê qiymetê bidin berhemên xwe. Kesek din nayê û ji cîhê me vê yekê nake. Niha em li rastiya xwe temaşe bikin. Pirtûkên Kurdî bazarek xwe hene - Na! 100-200 nivîskarê Kurd, ji nav 30 milyon Kurd ve, ku xwedî rêz û hurmet in hene- Na! Dezgehên Kurdî yê neteweyî ji bo pêşxistina edebiyata Kurdî hene- Na! Ger em berdewam bikin, em dê hîn bi gelek Na'yan re berbiçav werin. Ev e trajedî.
Ez dikarim weha bibêjim, rewşek fereh a ji bo afirandina berhemên mezin ên edebî yê Kurdî heye, lê rastiya ku qiymet nade edebiyata Kurdî asteng li pêş afirandina van berheman e.

*Pirs 4- Romana Kurdî divê bi Kurdî bê nivîsandin?*

*Cemal Batun - Bersîv:* Bê şik! Ger em romanekê wekî romanek Kurdî binav bikin, divê zimanê wê jî Kurdî be, ku bikaribe di nav edebiyata Kurdî de cîh bigre.

*Pirs 5- Ji bo nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê berhemên xwe bi zimanê neteweyên serdest (tirkî, erebî, farisî) dinivîsin, tu çi difikirî? Berhemên wan ên edebî di nav edebiyata Kurdî de têne pejirandin an na?*

*Cemal Batun - Bersîv:* Bi rastî ev pirsgirekek çetîn e. Her çend em bixwazin jî, em nikarin berhemên hêja yên gelek nivîskarên Kurd ku bi zimanên din dinivîsin, di nav edebiyata Kurdî de hesab bikin. Dibe ku qehremanên van roman, novel an berhemên din Kurd bin, dibe ku nêzî jiyana Kurdan bin, lê ew ne di nav edebiyata Kurdî de ne.

Wekî nivîskar Yaşar Kemal, Ehmed Arîf nivîskarên gelek mezin in. Ku ew bi eslê xwe Kurd in, bêguman ji me re serbilindiyek e, lê berhemên wan edebiyata Tirkî ne. Ez weha dinerxînim.

*Pirs 6- Romana Kurdî çawa dikare pêşbikeve? Rewşa çîrok û helbestên Kurdî yên nivîskî çawa ne?*

*Cemal Batun - Bersîv:* Romana Kurdî, di roja me ya îro de, nuh bi nuh destpêdike ku şiklek bigre. Pêşketina wê girêdayî derketina qelemên xurt û bedew e. Ev jî girêdayî vê yekê ye, ku em rêza nivîskariya Kurdî bikin, ku ev yek tesîrê bike gelek insanên ku newêrin rajin qelema xwe û bi Kurdî binivîsin, vê tirsê ji ser xwe ve bavêjin. Gava xwendevan, gelek rewşenbîr û xortên Kurd, rewşa nivîskar û edebiyata Kurdî dibînin, naxwazin qelema xwe bikar bînin. Ez erka her mirovê Kurd dibînim, ku pişt bide xebata nivîskarên Kurd a ku bîngeha pêşxistina edebiyata Kurdî ne.

*Pirs 7- Romana Kurdî ya modern heye yan na?*
*Cemal Batun - Bersîv:* Belê heye.

*Pirs 8- Tu berhemên nivîskarên Kurd (yên ku xwerû bi Kurdî dinivîsinin) yên nuh çawa dinerxînî?*
*Cemal Batun - Bersîv:* Ez dilşa dibim, gava ku ez berhemek nuh a nivîskarek Kurd digrim destên xwe. Ez dizanim, bê bi çi berxwedan û zehmetiyan ew bi vî karê hêja ve radibin. Herweha ji nav nivîskarên Kurd, gelek nivîskar bi rastî xwedî qelemek bedew in.

*Pirs 9- Tu berhemên kîjan nivîskarê cîhanê û yê Kurdan hez dikî, kî tesîra xwe li ser te kiriye û kîjanî nêzî xwe dibînî?*

*Cemal Batun - Bersîv:* Ez Dostoyevskî senemê edebiyatê, romannivîsê dibînim. Herçend min berhemên wî xwendibin, bi rojan ez di bin tesîra wan de ma me.

*Pirs 10: Tu niha li ser çi dixebitî? Planên te yên pêşerojê çi ne?*

*Cemal Batun - Bersîv:* Ez niha li ser antolojiya çîrokên cîhanê ji bo zarok û xortên Kurd, dixebitim. Planên min ên niha ku min dabe pêşya xwe ev e.
Ji bo îmkana ku we da min, ku ez hin dîtinên xwe li ser edebiyata Kurdî bînim zimên, spasiya we dikim.

# DIANA Û WEŞANÊN GIŞTÎ

Şahînê Bekirê Soreklî

Mirina mîra Îngliztanê DIANA di 31'ê heyva 8'em ya 97'an de cîhan hejand. Bêyî guman ew miroveke çeleng û qenc û dilpak bû; miroveke xêrxawaz û amancbedew bû, yek ji stêrkên xweşik yên cîhana me bû, lê yên DIANA di nav hiş û ramanên xelkê de gîhandinî ev radeya bilind weşanên giştî bûn yên ku li dawiya dawiyê herweha bûn sedema mirina wê jî. Weşanên giştî, bi rojname û kovar û radyo û televizyonên xwe ve, ne tenê malbata kirala Îngliztanê xistin bin siya DIANA, lê DIANA kirin beşekî ji jiyana rojane ya bi milyonan mirov, kirin yek ji mirovên herî navdar di dem û dewrana îroyîn de. Û nuha, li dû mirina wê, beşekî ji weşanên giştî dê wê bikin yek ji şexsiyatên klasîk yên dîroka mirovan, bi amanca firotina kovarine jinan, yan dîtina bêtir lêner ji bo bernameyên dezgehine televizyonê.

Ji roja zewaca keça ciwan li gel Mîr CHARLES û vir de, bi taybetî li dû ku têkiliya di navbera wan de dest pê kir ber bi hevberdanê biçe, medyaya cîhanê xwe bi şev û roj bi nûçeyên DIANA ve mijûl kir, yan nûçe di derheqê wê de afirandin. Ev dengdayîn û rûmeta ku weşanên giştî ji bo DIANA hanîn holê dest pê kirin bibin belaya serê wê çimkî jiyana wê ya rojane û ya şexsî, heta bi hestên wê bin jî, bûn mulkê raya giştî. Wênekêşan wek qertelan ew pan, gav bi gav dan şopa wê, ta ku bûn sedema mirina wê û 2 kesên din û brînbûna xeddar ya mirovekî.



Pirsa nuha tête pirsîn ev e: gelo azadiya mutleq pêwîst e ta çi radeyê ji bo weşanên giştî bête dayîn?! Çawa dibe ku wênekêş û rojnamevan dikarin wisa bi azadî jiyana xelkê li wan bikin jehir? Li milê din, çawa dibe ku moral û wûjdana mirovahiyê rê didin wê yekê ku wêneyeke şexsî ya mirovekê bikaribe bi milyonek û du milyon dolar bête firotin?! Çawa dibe ku rojnameyek, yan dezgeheke televizyonê, dikare amade be ku weqa pere ji bo wêneyekê xerc bike?!

Li dû mirina DIANA hema hema her kesî li welatên rojavayî nale li wênekêşên harşêwe yên ku wek PAPARATSÎ têyên nasîn barandin, lê yên ku kar didin van wênekêşan dezgehên navneteweyî ne, yên ku wêneyên van dezgehan dikirin rojnameyên rojavayî ne û yên meraqê li kirîna van şêwerojnameyan dikin xelkê cîhana me bi xwe ne. Bêyî meraqeke mezin li van şêwewêneyan rojnameyek ê nikaribe weqa pere ji bo wêneyekê bide.

---

Cîhana me her bi trajêdiyan dagirtî dimîne. Mirina miroveke 36 salîn, miroveke wek DIANA bi ew şêweya cîh girtî trajêdiyeke mezin e, lê trajêdiya herî mezintir berdewamkirina bazrirganiya bi nav û jiyana kesan e, bi gellek şêweyên ji hev cuda, û li hemî beşên cîhanê.

---

Mirina DIANA ji gellek haliyan de balkêşiyeke pirralî li gel xwe hanî. Bêyî guman, wek me li jor diyar kir, DIANA miroveke layiqe pesindanê ye û alîkarî ji bo gellek pirsên cîhanî daye, yan ji bo alîgirtinê hatiye bikarhanîn, ji Bozniya bigir ta Kurdistanê; ji Hindistanê bigir ta Afrîkayê. Gotinê naxwaze ku mirina wê yek ji bûyerên trajîk yên cîhana me bû lê li milê din, çawa dibe ku hêstirên li ser mirovekê hatin barandin ji yên li ser bi sedhezaran zaroyên Afrîkayî yên ji birçîna dimirine dibarin bêtir in, yan wisa ji aliyê weşanên giştî ve hat raberkirin?! Çawa dibe ku mirina wê weqa bandor li gellek mirovan kir, di dema ku mirina bi hezaran kesên din bandoreke weqa mezin li wan nake?! Mumkin e yek ji sedeman ew be ku DIANA ji yên din bêtir tête nasîn; heta dikare bête gotin ku ew bû bû wek endama malbata bi milyonan ji ber ku roj bi roj, hefte bi hefte, sal li dû salê mirov di rojnameyan de, di kovaran de û bi rêya radyo û televizyonê pêrgîne wêneyên wê hatiye, haydare deng û behsên wê bûye, û dengê wê bihîstiye.
Weşanên giştî êdî bûne hêzeke bêyî hempa di cîhana me de, dikarin mirovan navdar bikin yan riswa bikin, dikarin hukmatan rakin yan daxin, dikarin ramanan bifirînin yan di erdê bidin, û dikarin mêjiyên bi milyonan mirov ji sabûnê çaktir bişon û li gor daxwaza xwe têxin qaliban. Weşanên giştî bi şêweyên rasterast yan ne rasterast, aşkere yan nixamtî zûdereng bandoreke mezin li me hemiyan dikin.
Encamên bi mirina DIANA re hatinî holê jî gellekî balkêş bûn. Ji aliyê erf û toreyan de, ji aliyê siyasî de, û ji aliyê têkiliyên mirovahî û navneteweyî de. DIANA dest ji mêrê xwe, MIR CHARLES, berdabû û ber mirina xwe hevaltiya DODÎ MUHEMMED EL FAYID dikir. Ew li gel wî jî bi encama qezaya li Parîsê cîh girtî hat kujtin. Lê mîr CHARLES bi xwe çû û termê wê hanî Îngliztanê, li gel bavê xwe û herdu kurên xwe li dû cinazeyê wê meşiya. Bi hezaran hemwelatiyên Îngliztanê bi hest û kulîlk û ramanên xwe rêz ji wê re diyar kirin. Werin em têxin xeyalên xwe ku DIANA li şûna ku îngliz be ji Rojhelata Navîn bûya. Yekem, ew ê ji herdu lawên xwe bihata bêparkirin; duyem, mêrê wê eger ew nekujtiba jî, dê çi caran ew nebexşandaya; û hemwelatiyên wê dê ew wek keseke nizim bi nav bikirina û pêkan e bigotana, "xwedê cezayê wê dayê." Ev jî cudatiyên çandî yên rojhelat û rojava diyar dike. Mirov dikare bi şêweyeke din jî li wêneyê seyr bike. Xelkê Misir û weşanên giştî yên welatine ereb, dostaniya DODÎ MUHEMMED EL FAYID li gel DIANA wek sedemeke serbilindiyê didan raberkirin. Lê eger DIANA misrî bûya û Dodî îngliz bûya, gelo lênerîna li rewşê dê çawa bûya?! Gelo Misriyan wê demê xwîna jina misrî dê helal nekiribûna? Bersîvên van şêwepirsan dikarin xuya bikin ta çi radeyê lênerîna li jin û mêr û pirsa wekheviya mafên wan ji aliyê herdu çandan de ji hev cuda ne.
Di dawiya gotarê de min dil heye vê yekê bibêjim: Cîhana me her bi trajêdiyan dagirtî dimîne. Mirina miroveke 36 salîn, miroveke wek DIANA bi ew şêweya cîh girtî trajêdiyeke mezin e, lê trajêdiya herî mezintir berdewamkirina bazirganiya bi nav û jiyana kesan e, bi gellek şêweyên ji hev cuda, û li hemî beşên cîhanê.

www.arsivakurd.org

# KULTURA DEMOKRASIYÊ

## Lokman Polat

Di nav Kurdan de ji bo ku kultura demokrasiyê pêşve neketiye hinek sedemên bingehîn hene. Civata Kurd hêj jî jiyana gundîtiyê didomîne. Pêvendiyên civakî pêvendiyên modern nîn in, pêvendiyên gundîtiyê ne. Kultura eşîretîyê, kultura feodaliyê hêj jî di nav cîvakê de hukum dike. Tesîra axan, şêxan, serok eşîran li ser civakê zêde ye.

Di alî din de dewletên ku Kurdistanê dagir kirine, dewletên ku sazûmanên xwe li ser hîmên dîktatoriyê ava kirine ne. Di wan dewletan de demokrasî tune. Karûbarê wan, kirinên wan, yên antî-demokratîk in. Di nav wan gelên serdest de jî kultura demokrasiyê pêş neketiye. Ew bi xwe jî ji dîtin û ramanên demokrasiyê bêpar in. Fundementalîzma Îranê, faşîzm û şovenîzmiya Kemalîzmê, dîktatoriya Saddam û Hafiz Esad li dij demokratiyetê ne. Loma jî hem di nav Kurdan de û hem jî di nav gelên rojhilatê de şiûra demokrasiyê di nav civakê de belav nebûye, pêşve neçûye.

Ji salên 1940î heta salên 1960î di nav civaka Kurd de bêdengiyek hebû. Lê ji salên 1960î û virve di nav civaka Kurd de şiûra netewî gelek pêşve çûye. Li doza netewayî xwedî derketin, şiûra netewayî parastin, bi nasnameya Kurdî rêxistin damezrandin di salên 1970î de xwe da nîşandanê.

Salên 1970 û virve gelek rêxistinên siyasî yên Kurdan karûxebat kirin û potansiyelek muazam pêk anîn. Têkoşîna netewayî li ser hîmên vê potansiyelê pêşve ket û gihîşt merhaleya îro. Lê ev potansiyela şoreşgerî û netewayî bi kultura demokrasiyê nehat perwerdekirin. Sosyalîzma ku di wê demê de ji alî rêxistinên siyasî yên Kurd ve dihatin parastin sosyalîzmekî demokratîk nebû, li ser navê sosyalîzmê gelek metodên antî-demokratîk pêk dihatin. Zanistiya sosyalîzma demokratîk di nav kadirên siyasî de nehatibû fêmkirin.

..................................................................☞

Di Kurdistanê de pêşveçûna şiûra netewayî bi xwe re pêşveçûna şiûra demokrasiyê pêk nanî, kultura demokrasiyê pêşve neket, qels ma. Ji bo vê jî di nav têkiliyên rêxistinî de û di nav têkiliyên rêxistinan de pêkanînên antî-demokratîk derketin holê. Rêxistinek ku di nav xwe de demokrasiyê pêk neynê, di têkiliyên xwe yên bi rêxistinên din re demokratîk nebe, dê çawan di nav civakê de demokrasiyê pêk bînê? Helbet partî û rêxistin ji bo têkoşînê hacet in. Lê nêrînên partî û rêxistinan, programên wan, nêrîna wan ya li ser civakê, sazûmana ku daxwaz dikin pêk bînin gelek girîng e. Lewra partî û rêxistin hacete ku mirov bi wan bê ser hukum. Partiyek, rêxistinek wexta bê ser hukum, bibe îktîdar dê sazûmanek çawan pêk bîne, sîstemek çawan ava bike, di programa xwe de diyar dike. Ev dîtinên wê yên programatîk ji bo avakirina zagona esasî dibe bingeh, dibe îskeletek. Ji bo wê jî dîtin û ramanên programatîk yên partî û rêxistinan gelek girîng e.

Partî an rêxistinek ku azadiya ramanî, pirdengî, sîstema pirpartîtî, di peywendî û têkiliyan de norm û metodên demokratîk, perwerdekirina demokratiyeta civakî, tevbûnî û beşdariya demokratîk ji xwe re neke armanc û di programa xwe de cîh nede pê, wexta ku bê ser hukum, bibe îktîdar wê gavê tiştê ku pêk bîne bi yek gotinek navê wê dibe dîktatorî.

Wek têt zanîn bi salan e ku di nav Kurdan de, di nav rêxistinên siyasî de şerê birakûjiyê pêk tê. Her çiqas gelek sedemên wê hebin jî, yek ji wan sedeman ew e ku di nav Kurdan de û di nav wan rêxistinên siyasî de şiûra demokrasiyê pêk nehatiye, kultura demokrasiyê û tehamûlê li cihê xwe runeniştiye. Kurd û rêxistinên Kurdan ji hevûdu re tehamûl nakin, hevûdu hazm nakin, li hember hev dilpak û demokratîk nîn in. Ji hevre musamahakar nîn in. Divê ev nêrîna çewt, ev metodên antî-demokratîk ji holê bê rakirin.

Wek ku me pêşî jî got; dagirkirina Kurdistanê, bi zanîstî paşvehêştina civaka Kurd, hebûna feodalî û eşîrtiyê, di çar dewletên dagirker de bêpartiya demokrasiyê, sazûmanên wan yên antî-demokratîk, çewt fêmkirina sosyalîzmê, şîrovekirina doxmatîkî ya Marksîstiyê, versiyona sosyalîzma Stalînîstiyê, bûne sedem ku di nav Kurdan de, di nav rêxistinên Kurd de kultura demokrasiyê pêk nehatiye, pêşve neçûye, qels maye. Ev sedemên ku bi kurtahî min hanî zimên bûne asteng li pêşberê belavbûn û pêşketina kultura demokrasiyê. Yanê ji pêşveçûna şiûra demokrasiyê re bûne asteng.

Divê mirov di hemû qadên jiyanê de, di hemû peywendî û têkiliyên civakî yên sosyal de, di jiyana rêxistinî de, metodên demokratîk pêk bîne. Di têkiliyên di nav rêxistinan de divê metodên demokratîk pêk bê. Di nav civakê de fêrbûna demokrasiyê, pêşxistina kultura demokrasiyê divê ji mirov re bibe armanc û ji bo pêkanîna wê hewldanên berbiçav pêk bîne. Ji bo pêşketina ramanên demokratîk, lênêrîna civakî ya modern, têkiliyên nûjen yên sosyal, her Kurd divê hewl bide, xizmet bike. Watiniyên xwe bîne cîh. Divê bê zanîn ku pêşveçûna şiûra demokrasiyê, xurtbûna kultura demokratiyetê bi xwe re guhertinên civakî û pêşveçûnê tîne.

Lokman Polat
YASAKLANAN YAZILAR
Bi Tirkî
Derdikeve!..
Weşanên Çanda Nûjen
(Çağdaş Kültür Yayınları)

www.arsivakurdi.org

# DEMOKRASÎ

Xidir Egît

Piştî rûxîna sosyalîzma reel, di derbarê dewlet, demokrasî û dîktatorîyê de gelek şîrove hatin kirin. Emperyalîst û sermîyandarîya cîhanê, di rewşa sosyalîzma reel de, sosyalîzm an dewleta proleterya, mîna dîktatorîyek faşîst şanî dan û bi her pergalên komînîkasyonê li hemû cîhanê bi vî şêweyî propaganda wê kirin.

Gelek kadro û serokên partî û rêxistinên sosyalîst yên Kurd, mîna gelek hempayên xwe yên cîhanê, bêlêkolîn, bêtêgehîştinek zanyarî û dîyalektîkî, bi zanînek pînekirî û dirûre ku hemû hêvî û bawerîyên xwe bi sosyalîzma reel ve girêdabûn, ku her helwest û biryarên wan, ji xwe re mîna ayetên îlahî didîtin, piştî rûxandin û belavbûna sosyalîzma reel, hemû hêvî û xeyalên wan mirin. Sedemê hemû kêmanî û şaşîyên xwe, sosyalîzm dîtin. Êdî li nejiyandina gelek hîsên xwe yên axatî û dewlemendî poşman bûn. Tew hin kesên ku xwe avêtin metropolên Ewropa û ji nîmetên emperyalîzmê fêde kirin, ji bo ku borandin û xemgînîya xwe şanî bidin, neyartîya xwe li hember sosyalîzmê îlan kirin û mîna ku Emrîka, ji nû de keşif bikin, dest bi pesinandina demokrasîya lîberal ya kapîtalîst kirin!

***Gelo bi rastî demokrasî çi ye?***

Li gorî analîza Marks - Engels ya zanyarî ku ez jî beşdar dibim, demokrasî, şêwakî dewletê ye. Dewlet jî herdem, di destê çînekê ku li ser çîneke din pergalekî serwerî û çewsandinê ye. Yanî dewlet, şêwa wê çi dibe bila bibe, di destê çîna serdest de pergalekî dîktatorîyê ye: Maf û berjewendîyê çîna serwer diparêze û disitirîne.

Mîna sê hezar sal berê ku li Atîna derket holê, demokrasî, ji çîna serdest re desthelatî û azadî bû. Lê li hemberî kola, pergalekî dîktatorîyê, parastin û sitirandina mafê koledaran û berdewamîya koledarîyê bû.

Lê bi serwerîya sazûmana kapîtalîst re, ji bo ku burjûvazî bi temamî serwerîya arîstokrasîyê bişkîne û li hemû mazatên neteweyê serwer bibe û bi serbestî keda gel bimije, pêwîst dît ku dîktatorîya xwe veşêre; loma bi navê demokrasîyê komara xwe, mîna azadî û wekhevîya hemû hemwelatîyan şanî da. Lê bi rastî ew sazûman, mîna selaxanak mêtîna keda karkeran bû.

Piştî geşbûnîya sermîyana fînans, emperyalîzma cîhanê, mazatên netewî ji wan re teng hatin û dest bi dagirîya mazatên cîhanê kirin. Êdî dewlemendî û keda gelên cîhanê jî kişandin metropolên xwe. Gava ku mazat ji sermayedarên mîna Italya û Almanya re neman, wê gavê zû rengê demokrasiya wan hat famkirin, faşîzm û dîktatorîya rasteqînî îlan kirin. Piştî têkçûna faşîzmê û berfereh bûna Bloka Rojhilat dewletên emperyalîst bi rêya rêxistinên aborî, sîyasî û leşkerî bi hevre ketin hevkarîyê. Bi îlankirina aborîya lîberal re, di

dewlet û rêvebirîyê de jî demokrasîyek lîberal îlan kirin. Lewra bi vê sîyasetê, divîyabû ku mudaxeleya dewletê ya li ser aborîyê jî kêm bibaya. ji bo ku sermîyanê xwe, li welatê xwe têxe rêxistinek tendurist, berhimandina "meta" û herikandina kara ji mazatên cîhanê têxe ewlekarîyê û bi gelê xwe re têkeve aşitîyekê, hinek kara xwe bi rêya dewletê, mîna mafên civakî, ji gelên xwe re da xerckirin. Lê li ku mazat li wan teng dibin û kara wan kêm dibe, van mafana yekbiyek dîsa bi rêya wê dewleta "demokratîk" bi şûn de distînin.

Lê em baş dizanin hîna jî li gelek welatên kapîtalîst -bi sedema şûndemayîna aborîya wan ya ku kapîtalîzma lîberal ya emperyalîst wan talan dike û bi sîyasî û leşkerî wan xwedî dike - cûrbecûr şêweyên dîktatorîya vekirî serwer e. Yanî emperyalîzma Ewropa ya lîberal û demokratîk, xwedî û berpirsîyarê van dîktatorîyana ne jî. Îro dewleta Tirk, bi hêz û alîkarîya kê dîktatorî, faşîzm û kolonyalîzmê li ser gelê xwe û yê Kurd dimeşîne. Kê li Lozanê biryara parkirin û înkara Kurdistanê da? Evana tev meharetên demokrasîya lîberal ya Ewropa ye. Lewra bingeha demokrasîya xwe ya aborî, ji mêtîn û dîktatorîya xwe ya li ser gelên cîhanê distîne. Înkara vê rastîyê oportunîzm û xizmetkarîya emperyalîzmê ye.

Hetanî ku bûrjûvazî di dewletê de -du hêzên parazît- burokrasî û mîlîtarîzmê xwedî bike, dewlet tucarî nabe dewletek bêteref, azad û ya gel. Loma demokrasî jî, ji dîktatorîyê rizgar nabe.

Bîr û bawerîya sosyalîzmê, li ser daxwaza demokrasîyek bi rastî ava bûye. Rêxistinek bi rastî sosyalîst, rêxistina herî demokratîk e. Rêxistin an dewletek sosyalîst li gorî rastîya rewşa xwe, mercên demokrasîyek rast pêk nîne, ne sosyalîst e. Bi zanîn an bi nezanî, kesni têgeha dîktatorîya proletarya ne rast şîrove diki:

Di Marksîzm - Lenînîzmê de, ji bo sosyalîzmê tucarî û di tu derê de, dîktatorîya proletarya, mîna şêwekî (rejim) dewletê nehatiye parastin. Lewra dewleta proletarya bi temamî li ser berjewendîyê gel ava dibe û bi temamî ji teref gel tê îdarekirin. Dewleta sosyalîst, tu demê ji bo gel, mîna dîktatorîyê nehatîye parastin. Lewra dewlet bi xwe cîhazek dîktatorîyê ye.

Sedema ku behsa dîktatorîya proletarya hatîye kirin ev e. Ji bo demokrasîya proletarya jî hîn dewlet heye û di vê dewletê de hîn "aparat"a burokrasî û mîlîtarîzmê heye û ev hêzna jî ne li hemberî gel, ji bo burjuvazîyê ku têkçûye dîsa nebe serwer û li hember vêna qanûnê ku saz bûne biparêze, tenê di vê wateyê de xwedîyê fonksîyonek dîktatorîyê ye.

Bi kinayî, bîr û bawerîya Marks, Engels, Lenîn li ser demokrasîya sosyalîst ev e:

---

**Bîr û bawerîya sosyalîzmê, li ser daxwaza demokrasîyek bi rastî ava bûye. Rêxistinek bi rastî sosyalîst, rêxistina herî demokratîk e. Rêxistin an dewletek sosyalîst li gorî rastîya rewşa xwe, mercên demokrasîyek rast pêk nîne, ne sosyalîst e.**

*** * * ***

**.......divê em sosyalîst, di her xala jîyana xwe de demokrat û parêzgerê demokrasîyê bin.**

---


Şêweya dewleta sosyalîst ya sîyasî demokrasîyek bê kêmanî ye. Divê di sosyalîzmê de demokrasî, hetanî kerta dawîn bê geşkirin. Demokrasî çiqas tam be, ewqas jî pêwîstîya wê ji holê radibe, ev demokrasîya, di şexsê dewletek herî demokratîk de wê di xew re here û vemire.!

Bîr û bawerîya sosyalîst, bi teorî û pratîka xwe, bi bername û stratejîya xwe, bi rêxistin û rêvebirîya xwe, bi mîsogerî divê demokratîk be û li gorî rewşa ku tê deye her merc û qanûnên demokrasîyê pêk bîne. Rêxistin an desthilatîyek ku ji xwer dibê ez sosyalîst'im, ku merc û qaîdê demokrasîyek rastî pêk nîne, tu têkilîya wê û sosyalîzmê jî bi hev re nîn e. Divê sosyalîst, tu carî ne durû (ne xwedîyê çifte standadekê) bin: Em çawa li hemberî dîktatorîya bûrjûvazî, alîkarê demokrasîyê ne, divê em sosyalîst, di her xala jîyana xwe de demokrat û parêzgerê demokrasîyê bin.



www.arsivakurdi.org

Di sazûmana sermîyandarî de, em li hemberî îşkencê û cezayê îdamê bin û ewlekarîya jîyana mirova bixwazin; em azadîya ramanê û rêxistinê, azadîya çapemenî û weşanê bixwazin û mafê vekirina her partîya sîyasî ji bo namzetîya desthilatîyê û kirina muxalefetê biparêzin, pêwîst e ku di sazûmanek sosyalîst de jî em vana teva biparêzin û mercê wan pêk bînin. Welatê ku lê şoreş çêbûbe û ji xwe re gotibe em sosyalîst in ku van mercên demokrasîyê pêk nanîbin, ev şaşî û kêmanya wan dide rêdan; em nikanin vêna bikin gunehê "îdeolojîya" sosyalîzmê.



Marks - Engels - Lenîn dibên ku cîhê mîlîtarîzm û burokrasî lê hebe, azadîya rastî û geşbûnîya komunîzmê li wir çênabe. Divên ku çiqasî mîlîtarîzm û burokrasî nemîne û çiqasî demokrasî geş bibe, ew çivak ewqas bêtir xwedîyê azadîyê ye û ewqas bêtir nêzîkî komunîzmê ye.

Lê li gorî zanîn, lêkolîn û têgehîştina min, li welatên ku şoreş çêbû û dewletên sosyalîst hatin avakirin, mercên demokrasîya sosyalîst pêk nanîn: Sedem çi dibe bila bibe, şaşîya pêşî, rakirin û qedexekirina muxalefetê, xwe bûn û ji holê rakirina azadîya wan ya rêxistinî û ramanê bû. Ya din, tenê partîyek bêmuxalefet li qadê ma. Ev partî jî "şef"ek ket serê wê! Weke tê zanîn di sosyalîzmê de, bi sedema karektera wê ya demokratîk, tenê rêvebirîya kolektîf tê pejirandin. Partî, ne tenê bû xwedîyê desthelatîyê (hukûmetê), bû parçekî cîhaza dewletê jî. Yanî burokrasî û mîlîtarîzma dewletê bûn mîna organên partîyê yên xwezayî; loma rêxistin û komîteyên gel, fonksîyonên xwe yên bijartinê û pêkanîna prosesa demokrasîyê wenda kirin, êdî ji dêvla vana, "emir - komuta" şûna rêbazîya demokratîk girt. Loma burokrasî û mîlîtarîzma sosyalîzma reel, "ji ya bûrjûvazî jî qewîntir bû." Ev rewş jî bi xwe re -mîna dewlet û partîyên bûrjûvazî-, di navbêna gel, partî û dewletê de qetandin û bîyanîtîyek da çêkirin. Loma gel, li hemberî berhemên keda xwe jî ket hundir bîyanîtîyekê, loma alozîya aborîyê dest pê kir.

Mîna gelek rêxistin û partîyên sosyalîst yên cîhanê û yên Tirk, rêxistin û partîyên Kurd jî, polîtîka sosyalîzma reel kopya kirin. Civaka Kurd, ji kapîtalîzmê bêtir, di bin bandûra çanda feodalîzmê de bû û ne xwedîyê çand û kevneşopîyek kapîtalîzmê bû. Ji têgehîştin û toleransa demokrasîya bûrjûvazî jî bêpar bû. Kesê ku partî avakirin an bûn endamê partîya parçekê vê civakê bûn. Ji bo bên guhertin û demokrasîyek sosyalîst hîn bibin, bipejirînin û bi kar bînin di hundir evalusyonekê de perwerdebûnek ku di pratîka jiyanê de jî bê bikaranîn pêwîst bû. Loma partî û rêxistinên me, him di hundir xwe de û him jî li dervî xwe, ji karanîna demokrasîyek sosyalîst ya rastî bêpar man.

Lê di derbarê sosyalîzma reel û rêxistinên xwe yên sosyalîst, divê em hinekî bi însaf û durist bin: Vana tev parçekî dîrok, nirx û pêşdebirina sosyalîzmê ne. Bi bingeh û fonksîyonên xwe ji partî, dewlet û dezgehên bûrjûvazî çêtir û pêştetir bûn. Gelek feydeyên giranbuha ji me û mirovahîyê re pêşkêş kirin. Îro ku gelek mirovên mîna min ku di zanîna mirovahî, heq û huquqê xwe de ye û bîra van tişta dibin, ew jî bi xêra wan rêxistin û rêvebirîyê bi qisûr û kêmanî bûn. Îro vatinîya ku dikeve ser milên me, ne ku em wan ji kokê de red û înkar bikin; divê em xwe jî bi wan re rexne bikin; kêmanî û şaşîya derxin holê; li mîrasa xwe xwedî derkevin û wê pêşdetir û bilindtir bikin.

# Demokrasî, Wekhevî û Kes



Alî Bîçer

Demokrasî û wekhevî; hema bibêje ne tuwane (mumkun) ye ku, ev herdu mefhûm ji hevdu cuda bên raman kirin. Ev herdu mefhûm hevdu temam dikin. Mîna herdu ruyên medalyonê ne, li ser rûyekî wê demokrasî, li ser yê din wekhevî heye. Lê, yê ku herdu rûyên medalyonê dighênê hevdu kes(ferd) e. Ev hersê olgu him bi wate û bi girîngîya wan, him jî, bi pêvgirêdanên wan yên bi hevdu re li gel cudabûnên(farqên) wan emê hewl bidin ku, li ser wan mijul bibin.

Demokrasî, yek ji pirsgirêka herî serekî ya çaxê me ye. Li gel ku wekhevî mîna mefhûm bi awayekî ji awayan di hemû kitêbên - di olên bi yek xwedayî de - pîroz de dibuhure, demokrasî ne peyde dibe, ne jî derbas dibe. Ez texmîn dikim hewcedarî nîne ku, ez ji ber balkêşîya vê yekê binê wê xêz bikim. Demokrasî mîna mefhûm ifadeya xwe di dema xwedeyetîyekê, gelek xwedeyetîyê de û di têkoşîneke di navbera xwedeyan de ku xwedî mêzîneke bi reng dîyalektîkî ye, li Yewnanîstana Kevnar hatîye pê. Lê ku nakokî û têkoşîna demokrasîyê gelekî kevnar e, rastîyeke bi serê xwe ye. Ramana demokrasî, berhema rewşa mirovan ya ku bi hevdu re bi kom dijin, bi xwe ye. Ji ber ku, mirov heta di dema xweyî herî hov de kom bi kom dijin, têkoşîna demokrasî jî, dîroka mirovantiyê şopandiye û di bin navên ji hev cuda , sedem û nakokîyên cur bi cur de heta roja me ku ev yeka ha domandîye, dikare bê ramandin.

Ji ber vê yekê jî, demokrasî ne bi tenê di demeke dîrokî ya dîyar de ya ku mîna birevebirinê(şiklê dewletê) derketîye meydanê, di hema demê de, bi dîroka mirovantîyê re dest pêkirîye ku peyde bibe, divê ku mîna amanceke jîyanê û kultura wê bê ramandin.

Em li demokrasîyê mina birevebirina dewletê care pêşî li Yewnanistanê liqayî tên. Yewnanîyan, destpêkirina ku biryarên xwe yên ku nisbet bi Siteyê(polîs)bûn, ji alîyê hemwelatîyan ve bigrin. Bi nisbet dîrokê ev biryareke gelekî girîng e: Deme ku li Mezepotamya, li Misrê, li Rohilata Dûr melik û imparatorîyên koletîyê çaxê xweyî zêrîn dijiyan, heger ku yewnanîyan siteyên xwe bi biryarên hemwelatîyan bireve dibirin, gaveke zehv ber bi pêşve bû. Lê, di nav mefhûma hemwelatîyê ya yewnanîyan de kole û bîyanî hemwelatî nedihatin hijmartin. Dîsa jî, her gotina ku ji devê melik, ji yê imparator derdiket û mîna qanûn dihat hesibandin, bi kêmasî jî bê, biryar û qanûnên ku ji alîyê civatokê ve dihatin çêkirin, bê gifûgo di navbera wan de cudabûneke(farqeke) mezin ku heye, divê ku bê pesend(qabûl) kirin.

Di navbera van herdu birevebiran de cudabûneke "besit" heye: Di ya yekê de kes, heta bi civatê jî, negirîng e, melik û imparatoritî girîng e. Eynî, mîna kesê ku li ba olên bi xwedeyekî û gerdûna (dinya)din e. Heçi li ba ya diduwan(li cem demokrasîya yewnanîyan) e, heger ne ji bo hemû kesî bê jî, dewlet ji bo birrekî gel e. Mafê kesitîyê(fer-

diyetê) ji vî beşî re hatîye pesend kirin. Ji ber ku, mafek ji mafê herî bingehîn ku mirov pê dibe ferd, mafê bijartin û yê ku mirov tê hilbijartinê ye. Naxwe, li têkoşîna demokrasî mîna têkoşîna kesitîyê jî mirov dikare têbighe. Heger ku em her kesî ji bûyîna xwe ve wekhev û azad pesend bikin, divê ku bê pesend kirin ku, ev wekhevî di sazîyên azadîyê de û di yekîneyên dewletê yên cur bi cur de bêne parastin. Ev pevgirêdan, bi taybetî ji alîyê ronakbîrên Ronesansê ve derketîye ber bi pêş û li ser hatîye mijul kirin. Têkoşînên di piştre yên çînayetîyê û bi serpêhatîna şoreşan re mefhûma demokrasîyê li gel mefhûma kes hêdî bi hêdî bêhtir guncîyaye. Dîsa jî, carcaran, Lîncol"birevebirina gel , ji bogel, ji alîyê gel ve" an jî teorîya pêşengê çaxa ronaktîyê J. J.Rousseau "Desthilatdarîya gel" nasname kes di nav mefhûma "gel" de hiştîye ku biçirmise, divê ku bê têgihiştin. Ji ber ku, mefhûma gel bixwe re himbizbûna / yekkirina berjewendî û nakokîya birrê mirovan yê ber fereh bi xwe re tîne. Di salên piştre, Marksizm - Lenînîzm di bin mefhûma "proleteryayê" de, ber bi vê himbizbûnê / temerkûzê ve çûyîye. Ev yeka ha, ji alîyê eborî ve dibe ku rast be, lê girseyên ber ferh yên ku berjewendîyên wan yê eborî bi hevdu re diguncin, nayê wê wateyê ku di warê siyasî û ramanî de jî, dibe ku bi hevdu biguncin. Heger ku bi rastî weha bana, dê him li dar xistina şoreşan him jî domandina wan gelekî hesan bana. Li gel ku eynî / yek şart û şûrûtên eborî bi hevdu re par dikin jî, raman, rabûn û runiştina mirovan gelekî dij bi hev û bi farq e. Yê ku kes dike kes, ji cihê wî yê eborî bêhtir, raman, rabûn û runiştin û awayê neqandinê(hilbijartinê) ye. Marks, bi mafdarî dibe:" xulasa / naveroka mirovî yekûna peywendîyên civakî ye." Li gel ku ev yeka ha, weha ye jî, di her mirovî de encamên eynî yekûnê em bi dest naxin. Encema civakî, ya her mirovî cuda ye. Ya ku kes dike kes jî, ev cudabûni ye. Di hema demê de, ev yeka ha, tê wateya têkoşîn, geşbûn û dewlemendîya mirovî.

Mefhûma bûyîne kes(ferd), parastina cudabûna xwe ye, derketina ji nav ya hesayî ye, bi destxistina mafê hewldana ji derveyî ya hesayî ye. Pirranîya serpêhatîyên dîrokî, bi bîrewerbûna bûyîne kes, ango derketina ji ya hesan û ji çalakiya tevgerkirinê çêbuyîye. Stêrnasê bi nav û deng Copernic, di demeke duvdirêj de di ceribandinên xwe de bi ser nakeve. Ew jî, mîna her mirovê bi aqil, ku bîrewerîya kesi(ferdî) standîye, dirûnê û li pey ya hesan dikeve. Dibê: " Bi paldana li ser bîrewerîya ku stêr li dore gerdûna(dinya) me dizivirin, nikarim dîyardeyên esmanî çareserbikim. Vêca, ezê jiberewajîya wê biceribênim: Ezê li bûyêrên esmanî bi bawerîya ku gerdûna(dinya) me li dora wan dizîvire, binerim." Piştî vê yekê ku bi ser dikeve!.., Heta wî çaxî dihat bawer kirin ku navendîya kaînatê gerdûn (dinya) e. George B. Show Dibê: " Kesên bi mantiq bi dorbera xwe re diguncin, heçî mirovên bê mantiq in, hewl didin ku dorbera xwe bi xwe re biguncinin. Ji ber vê yekê jî, hemû pêşketin berhemên kesên bê mantiq in" George B. Show, li metoda Copernic ya ku di warê zanistîyê de, li zanistîyê bi cudayî nêzîk dibe , bi tedbiqkirina di warê hemû jîyanê de, bêhtir bi wate dike. Vêca, demokrasî mîna têgihiştineke kulturî tam li vir pêwîst e, ango di kelîka ku cudabûn derdidekevin meydanê, heger ku em pesend nekin jî, divê ku ew bi têgihiştînî bêne pêşîwaz kirin, divê ku mirov tuwane(îmkana)jîyandinê bide wan û rawestandina lipêşberî çewsadinên ku li ser van cudabûnan tên tedbiqkirin, derkeve. Çewsandinên ku li cudabûnan tên kirin bi tenê di mistewa ferd de nayê kirin, carînan dibe ku cudabûnên netewî yên gelekî mezin bên înkar kirin, ew gel, mecbûr dimîne ku têkoşîna vê yekê bide.

Cudabûnî, bi tenê li ba kevneşopîyan, rabûn û rûniştinan, ji alîyê yên ku berjewendîyên wan di vê yekê de hene, nayê çawsawandin. Di hema demê de, ji alîyê têorîya wekhevîyê ya ku xwedî naverokeke pêşverû û demokratîkî e jî, tê çawsawandin.Li demeka ku li Emerîkayê pevçûna reşik û sipîyan(nijadperestîya sipîyan) li dar bû, ev pevçûn heta li dibistanên seretayê /destpêkê jî, hate xwîya kirin. Li dibistaneke seretayê pevçûn bêtir di dema ku li trembêla serwîsê siwar dibûn, dihate pê. Dihat xwestin ku yên reşik li paş, yên sipî jî li pêş bên rûnandin, reşik jî li himberî vê yekê derketin. Mamosteyê wan ramîyaye / mijul bûyîye, di dawîya dawîyê de çareserkirineke "çirisandî" dîtîye. Zarok li dore xwe dane hev, gotîye:"zarokno !", "ji niha pê ve reş - spî nîn e, em hemû qahwerengî ne. Divê ku hûn bawer bikin ku hûn qahwerengî ne. Ji ber vê yekê jî, tu sedem namînin ku hûn bi hevdu biçin. Zarokan ev yeka ha pesend kirine, mamoste jî bêhnek bi rehetî standîye. Di êvara êynî rojê de, tam di kêlîya ku wê li trambêla serwîsê siwar bibana, zarokekî spî xwe avêtîye ber bi pêş ve, gotîye:"hevalno!" " Yên ku qahwerengê tarî ne, ber bi paş ve, yên ku qahwerengê zelal in, ber bi

pêş ve." Heta ku jê hatîye kirîye hawar. Mîna ku tê xwîya kirin, nerîna mamosta ya "çirisandî" bi kêrî tişteki nehatîye. Lê nayê zanîn bê ji ber çi ye, metoda ku bi tunebûna cudabûnan wekhevîyê bi dest dixe, zehv zal e. Mînak, ji devla ku cudabûnên di navbera jin û mêran de bê giftûgo kirin û têgihiştin, em hemû mîna mirovan hewl didin ku, jin an jî mêr di nav mefhûmên mîna gel, çîn de tune bihesibênin. Disa , di dema Mao de, bi lêkirina cil û bergên bi yek tîpî li milyonên mirovan, heta hewldan ku cudabûnên çinayetî ji meydanê rakin. ‹roroj jî, demegojîya ku KT. li pêşberî pirsgirêka kurd bi kar tîne ev e:" Tê gotin ku, em dewleteke demokratîk in, û hemû hemwelatîyên me wekhev in." Bi rastî jî, Dewleta Tirk hemû hemwelatîyên xwe mîna mafekî destûra bingehîn wek hev digre, lê bi şartekî, di serî de kurd, bi înkarkirina hemû cudabûnên netewî û kêmenetewî û ji bo heryakê ku xwe tirk dibîne...


Ev helwesta KT. ne gelekî dijberê têgihiştina dewleta demokratîkî ye, belkî jî, ji ya heseyî qabatir e, ya herî bi zext e... Heger ku em bela xwe ji birevebirinên(rejimen) leşkerî û diktatorîyên faşist vekin, heta bi dewletên herî demokratîk jî, hewl didin ku bi mefhûma wekhevîyê ya durû çerxa xwe bigerênin. Hema bibêje, hemû cure dewletên demokratîk li pêşberî cudabûn û farqan e. Li ba hinek dewletan, mirov dikare cudabûnan bibîne, lê ew ne yên kvantatîv in. Cudabûnên ku nayêne pesend kirin bi tenê bi cudabûnên netewî, kulturî ve ne bi sînor in, ya girîngtirîn, cudabûnên civakî û yên çinayetî jî, pesend nayê kirin. Yek ji dewletên herî demokratîk ku tê hesibandin, nerîna demokrasî ya Swistra: Ma gelekî ji demokrasîya antîk ya yewnan bi farq e? Li Yewnanîstana Kevnar, ji ber ku kole û bîyanî(penaber) hemweltî nedihatin hesibandin, biqasî ku ji mafê hilbejartin û yên ku bêne bijartinê mahrûm bûn, li Swîstra jî, karkerên biyanî û penaber li gel gelek mafên civakî, ji mafên hilbijartin û yên ku bêne bijartinê jî, mahrûm in. Ji bo yekî bîyanî ku bibe hemwelatîyê Swîstra biqasî ku ji kolekî re ji koletîya xwe rizgar bibe û bibe hemwelatîyê Yewnanîstanê, sext e. Disa jî, qanûnên Swîstra dibêjin ku mirovên ku li Swîstra dijin, wekhev in. Piştî salên 1936 an, rejîma Sovyetê (Stalîn) îddia dikir ku êdî cudabûna di navbera çînan de nemaye, digot ku êdî hemû kes bûne wek hev, êdî dewlet ne ya çînekê(proleterya) ye, bûyîye dewleta gel. Çawtîtîya herî mezin ya çaxê me, nexweşîya yekkirinê / himbizkirinê ye.

Heger ku dê dewletek hebê(ku şart û şurûtên îro em têde ne, vê yekê pêwîst dikin), divê ku ew dewlet dewleteke demokratîkî be. Ji dewleteke demokratîkî an jî partî û rêkxistinê ya ku ez têdighim, pêwîst e ku pêşîyapêşî cudabûnan bipareze û ewledarîya wan misoger bike. Ji bo hunandin û domandina wê dewletê jî, ifadekirina mirovan bi mefhûmên mîna netewe, gel, çîn wirdetir, divê ku mîna ferd karibin xwe îfade bikin. Ferdbûnî ew e ku mirov li xwe ewledar be, li pêşberî pirsgerêkên xwe taqata têkoşînê di xwe de bibîne. Ferdbûnî ne ew e ku bi serê xwe ji hemû tiştî qut bijî, ji xwe îmkana vê yekê jî nîn e. Ferdbûna ferd, di nav girseyan de bi wate dibe. Ferd, dema ku pirsgirêkên girseyan mîna yên xwe dît, bi rêxistin kir û têkoşîn da, dikare ferdiyeta xwe bidomine. Ferd, dema ku dest pê kir bi yên din re kar bike, bughere û bê guhertin, mefhûma wekhevîyê dikevê dewrê. Biya Kant, "Wekhevî ew e ku tu kes ji bo amanca yên din nebe alet." Wekhevî ne tunekirina cudabûnan(mîna yên politîkî û kulturî) e, ji bo xatirê ya rind ne daxistina mistewa yekkirinê ye, ji berevajî hînbûna jiyana bi dudabûnan re ye, biqasî hev xwedîbûna mafên politîkî, kulturî û yên eborî ye. Cudabûnên politîkî, çandî bi tenê ne dewlemendîyêke civakî ye, herweha motora geşbûn û peşveçûnê ye jî.

| | |
|---|---|
| Wer: N. ZAXURANÎ | Elî Bîçer |
| 19 Nîsan 1998 | 30 Adar 1998 |
| Stockholm | Bern |



# GULÊ Û DILŞADÎ





## Îlerî Bîçer

MAPÛS

Rizandin sê kesan
Her dem bi malbatek
Îşkence kirin
Kuştin hemû kesan
Hinek jê mirin
Hinek seqet bûn
Malbatên wan
Di nav meraqê de man
Rojek dê derkevin û bên
Bigijin azadiya xwe

GULÊ

Keçikek gundî bû
Paşê hate bajêr
Dibistanê qedand
Zewicî
Mêrê wê dibistanê neqedand
Kete hepisê
Di her hevdîtinê de
Bi kurê xwe re
Dihat
Didît mêrê xwe
Vedigeriya malê
Diçû kar
Vedigeriya malê
Bi dilşadî dijiya

DILŞADÎ

Malbatan parvekirin
Şadiyê xira kirin
Bavê zarokan
Girtin
Şadiyê parvekirin
Yê ku tenê şadiyê
Paşve bînê
"Azadîye"

*Têbinî* : Îlerî Bîçer wexta van helbestên jorîn nivîsand zarokekî 10 salî bû. Bavê wî di hepsê de bû. Wî bi Tirkî nivîsîbû, Lokman Polat helbestên wî wergerand Kurdî.

www.arsivakurdi.org

# FOLKLOR (zanyarîya gel)

A. Dêrsimî

Dema ku mirov bixwaze li ser şaxek zanyarî,dîtin û nihêrînên xwe rêz bike û bide raya gel,divê bi rêbazên zanyarî lêger û lêkolînên xwe li hawîrdor, kûr û dûr kuta bike..

Folklor "zanyarîya gel.A.D." teybetîyek xwe heye û jê re zanîn û pisporîyek pêwîste. Lê bila şaş neyê fahmkirin. Ez ne lêgervanê zanyarîya gel û ne jî pisporim. Min zanîngehê girse kuta nekirîye û min îcazetek jî nîn e.. Lê, bi salan karê hunerî, çandî û nivîskarîyê kirîye. Ji ber va sedemên han ez xwe bi xwe hînî zanîna vî karî bûm e.!

Ji mêj ve: Çîrok, stran,destan, şano, serpêhatî, lîstik û dîlanên Kurdî ji bo min gelek balkêş bun. Min birc û bingehên afirandinên wanan yên dîrokî, civakî û çandî mereq dikir.Her şaxek teybetîyek xwe heye û bi zanyarî yê ve girêdeyî ye. Adet û tore, helbest û destan, şiklê hîssî ya gel û gelek tiştên din di hundurî zanyarîya gel de kom dibin.

Di despêkê de merîv dixwaze hîn bibe gelo ew Folklor çi ye, bi çi mana yê ye? Ji bo wê min li Ferhenga Kurdî yê ku D.Îzolî amade kirîye nihêrî. Bersîv wisane. *"Folklor : N. Îng. Folklora Kurdî bw.(biwêj) Kürt halk oyunlari."* Raste, folklor biwêjeke bîyanî ye. Lê ew mana û danasîn kêm e, çewt e û gelek hêsan e. Mixabin, folklor ne bi tenê di mana dîlan û lîstikê de ye. Bi awayî ve jî lîstik û dîlanê zêdetir e. Ji ber ku Folklor li her welatî û ji bo her gelî derbaz dibe.

Ew jî ev e: bi adet û tore û kevneşopî, bi wîje yê nivîsandî (roman, çîrok, helbest, serpêhatî, destan, pêkenok, şano ûhwd.) û devkî û lîstik û dîlanên xwe bi reng û hêja ne.Demê ku ji bo zanîn û naskirinê li ser her nifşên wanan lêkolîn û lêger bê kirin ji wê xebatê re lêgerîna zanyarîya gel tê gotin.

Bê guman di warî lêgerîna zanyarîya gel ê Kurd de seydayê mezin Mamoste *Cîgerxwîn* bi hejmareke bilind pirtûk, helbestên hêja û nivîştên dîrokî pêşkêşî çand, ziman û wîje ya Kurdî kirîye. Berhemên wî yê nemir yek jî wan *"Folklora Kurdî"* ye. Di sala 27.11.1965 an de di pêşgotina xwe de ji bo zanyarîya gel wisan nivîsandîye."Bê gumane ko dewlemendî û mezinahîya zimana bi folklor û rewş û pergala tore, rîst û nivîsarên wa ye. Çi zimanê ko folklor û tore têde fireh û mezin bûne, ew ziman, zar, şiwe ji zimanên mezin têne jimartin. Herwekî pêşveçuna dezgeh jîna civakî jî yek ji van tiştan e. Ko ziman pêşve dibin û fireh dikin. Lê ji ber ko, em, niha dabaşa folklor da ne dixwazin vê dabaşê bidin xuyakirin..."

Wek tê pejirandin,divê mana folklor jî her wek lîstik û dîlan bi hesanî neyê tesbîtkirin, Folklor bi çendetexlît û dewlemendtir e.Bi mana felsefî di wari çandî û civakî de reng,deng û cûreye ke netewî ye. Çawa ku îro ew destanên Kurdî yên nemir; Mem û Zîn, Sîyabend û Xecê, Evdalê Zeynikê ji şewata mirinê hatine rizgarkirin, divê heyîyên din jî, ji mirinê bên e azadkirin.

Bi vê yekê em baş dizanin ku, welatê me ji mêj ve di bin hikumranîya Tirk, Ereb û Eceman de ye. Her tiştî me kambax buye, hatîye talankirin, hatîye tunekirin. Lê îro pê de divê ew tarîya sedsalan, ew êş û janên têkûz ku Kurd têde ne, li ser wan rabibe.Va curê netewî nû ve bêne afyrandin, jê zêdetir jî xebatek zanyarî li ser bê kirinê.

Niha jî dixwazim çend gotin û bêjan her wek mînak di derheqa zanyarîya gel de li ser şaxên başqa, başqa rêz bikim. Lîstik û dîlanên me: Di her livînekî xwe de, ewîn, şahî, hesret, lehengî û hunereke bê hempa radixin ber çavan.Tê de gelek jan û êşên şexsî û civakî hene kûr û dûr tên. Dersdar in.Balkêş in.Hînkar in... Bi hîssên netewî ne, afirînên wan Kurdewarî têne meydanê. Bi cil û cor û xemilandinên xwe, bi stranên xwe, bi müzîkên xwe aîdê me Kurdan e û dîrok şahîdê ye, da ku tu kes van nikare ji me bidize..

Destan, klam û helbestên kurdî ji mêj ve û ji dîrokê nesilîn û digîhîn roja me. Ji duhî ve heya îro, ji îro jî, ji pêşerojê re wek pirekî nemirin. Her stran evînê, hesretê û daxwazîvên sed salan tînîn ziman. Nebaşî û nakokîyên nav civatê, lehengî û serkeftinên şexsî û yên gelemperî tînîn ziman. Herwekî din demê ku merîv serlêdana dîroka Kurdan yê kevnar û yê nêzik bike, folklora Kurdî her çiqas azad nebe jî şop û rêçên jîyana civakî û çandî radixe ber çavan. Bi temamî mîrov ji stran, çîrok, dîlan û hîssên netewî tirxan bike, qe-rekterê gelê Kurd bi daxwazên pak: Aşîtî, azadî, mîrovhezî, lehengî, maf parêzî, xêrxwazî û qencî yê derdikeve pêş! Nebaşî û nakokîyên ku îro di civatê de hene, ew jî, ji xirabîyên dijmin tên. Û bi darê zorê xistine nav Kurdan.

Ji Kurdan re fikrê netewî, fikrê dewletbûyînê pêwîst e. Dîvê zanyarîya gel xwedî derkevin, berpirsîyarîyan bigirin ser milê xwe, hevkarîyê û palpiştîya hev bizanibin. Ji bo civateke zexm û xurt û pêşketî hin sereta hene ew jî ji xusesên aborî heya seretayên hîssî a zanyarî ve elaqeder in. Divê di çavkanîyê va sereta ande, mîrov, jîyana xwe yê çandî li ser temeleke xas ava bike û bijînî nî. Ji bo pêşvebirina vê avahîyê jî serbestîya zanyarîya gel ji civatê re ewledarîyeke mezin e. Ji ber ku, navnasîya netewî zexm dike. Afirandinên hunerî yên pêşvebirî û quwetê guhêrkarîyê şanî dide.



Bê guman heyîyên me yê çandî, di çerçeva zanyarîya gel de hevcedarîya şîrovekirinê ne. Tê de hinek motîvên balkêş hene ku ji bo her kesî û her demê pêwîstin. Demê ku qala zanyarîya gel dikin, feraseteke kûr û fireh tê bîra min. Ew feraset jî ji jîyana gel, şiklê hîssî, ramanî û hunerê ve girêdayî rolekî teybetî dileyîze. Zanyarîya gel rewşa civakî, dîrokî, psîkolojî, herdkolanî û bi normên qewmnasî yê ve girêdayî ye.Ew bi lêger û lêkolînên pispor û rewşenbîran derdikevin holê. Rastî ya van ya çandî mîrov û jîyana mîrov ve xwe dide der, pêş dixe û di guhêrîne. Zîndî ye û tevgerek e, hacetan bi xwe ve livîne.Ew hususîyet tiştên gel yê xweru û yên ne xweru ji hev dertîne. Bi şiklekî nû, bi naverokek têr û tijî û bi rindî (estetîk) yê di navbena sentez û yekbunîyê de vekêşanê diafirîne. Ew vekêşan bîyanîbûyîna çandî xwedî nake û bi sereta yên xwe dijî wê derdikeve...

# GOVENDÊN GELÊRÎ

Gabar Çiyan

Dawet û şahiyên bê govend, mîna savara rijî ye. Ew, dawet û şahiyan rengîn dikin, danûstandina nav mirovan germtir dikin, jiyanê bi mirov xweştir dikin û rêlêvedikin ku mirov çanda xwe, ji çend awiran ve bide jiyandin û bipêştir bixîne.

Gelên li Mezopotamyayê, bi taybetî gelê kurd, ji awira govendan ve pir dewlemend e. Ev dewlemendî bala gelek mirovan kişandiye. Gelek caran kurdan bi xwe, ji xwe pirs kirine ku; ev dewlemendîya wan çiqasî kevn e. Anku pirsên jêrê hatine pirsîn: wateya dîlanên gelêrî çi ye? Dîroka wan çiqas kevn e? Mesajên di wan de çawa çêbûne û tên çi maweyê? û hwd.

Li ser van pirsên li jor, lêkolînên pir alî hatine kirin. Beşek ji pirsan, bersîvên xwe hene û beşek jî, bi zaniyariyên nû her roj dewlemendtir dibin.

## *Govendên gelêrî*

Dîlan, bi hebûna mirovan re peyde bûye. Mirov vê rastiyê di kolandinên arkeolojîk de, şopa wan di pirtûkên pîroz, Tewrat, Zebur, Încîl, û Quranê de dibîne. Li ser nirxên arkeolojîk gelek caran wêneyên înstrumentên mûzîkê hene, an jî komek dîlanê. Di pirtûkên kevn yên pîroz de, weke mîsal ya Samuel de (z - 6 . 14) nivîsek wisan heye: "Dawut bi cilên xwe, li ber xwedayê xwe dest bi reqsê kir".



Di destpêkê de, mirov li hember afatên xwezayî, heywanên hov û berî, bêçek bû û bitirs bû. Anku mirov herdem hewcedariya xwe bi kêşandina wêneyan, lêxistina înstrumentan, stirandin û dîlanê hebû ku kul û keserên xw bîne zimên, pirsgirêkên xwe bi riyên wisa îfade bike. Belê, dîlan jî rêyek bû ku mirov êş û tirsa xwe, hêvî û kêfxweşiya xwe têde bîne zimên.

Govend, rengên xwe ji jiyana gelan, bîr û baweriyên wan girtine. Ji ber ku li gelek dewerên cîhanê, gelek mirov ji olekê bawer dikin û di dîrokê de çi hezan nikaribû rê li çûn hatina mirovan bigire, çandan tesîr li hevûdu kirine. Dema mirov vê tesîrê bipejirîne, dikare wateya govendên gelêrî wisan formûle bike: "Dîlanên ku ji aliyê welatekî ve tên kişandin, rengên wê netewê tê de bi giranî xuya bikin û demek e dûr û dirêj li wir hatibin lîstin, ew govendên gelêrî ne."

## Formên govendan

Tê qalkirin ku li hinek welatên li Afrîkayê, formên xweser hene. Li ser nimûneyên wisan kêm hatiye nivîsîn. Lê lêkolînên li ser wan ji zû ve dest pêkirine. Dema mirov van formên taybetî bipejirîne û mîna beşek xwesr qebûl bike, dikare tevayê formên din di bin sê bendan de bicivîne: "Dîlanên girovîskî, dîlanên komî û dîlanên bi cot". Mirov, di dîlanên girovîskî de bi destên hevûdu digre û mîna çemberê digere. Çember dikare mîna gustîlke, anku xeleka tiliyan girtî be û dikare deriyek xwe jî hebe. Di dîlanên komî de, lîstîkvan cot in û çend çot bi hevre li hemberî hevûdu, an jî çarqorzî bi rêz dibin. Di dîlanên cot de, cot bi hevûdu re li gorî rîtîma mûzîkê diçin û tên.

Pêyen lîstîkvanan bi tevayî, bi gavên giran berepêş, bi gavên sivik-bazdan bere pêş, sê gav û gavên berepaş, diçûn û tên.

## Dîlan

Dîlan rîtm û tevgera li ber mûzîkê ye. Li ber stran û înstrumentan dîlan tên kişandin. Gelek ji rîtman wateyên xwe hene û ew wate, ji jiyana gelan ketiye nav. Anku hinek ji rîtm û tevgerên ku di govendan de hene, neynika milletan in. Ew rîtm û tevger, li gorî çandan tên guhertin. Weke mîsal, li hinek welatan bêhtir tilî û serî diçin û tên. Li Hindîstanê ev alî xwe bêhtir dide der. Li hinek welatan nigên mirov bêhtir diçin û tên.



Belê, weke ku tê dîtin çi dîlanên kevn û çi jî yên nû, di rojekê de çênebûne. Wan, di pêvajoya dîrokê de, di rojên reş û teng de hevaltiya mirovan kirine û bûne tercûmanê kul û keserên wan. Wan rengên xwe ji jiyanê, ji adet û toreyên gelan girtine û neynikên dewlemendiya neteweyên xwe ne. Ew rengek ji jiyanê ne û motora moralê ne. Gelên li Mezopotamya, bi taybetî gelê kurd di vî alî de têra xwe dewlemend e û ev dewlemendî tê wê wateyê ku, dîroka kurdan pir kevn e û ew xwedî çandek pir reng û pir dewlemend in.

Edwar Petîşka
Mîtolojiyên
Mezopotamya
Wergêr :
Cemal Batun
Bixwînin !

www.arsivakurdi.org

# Cîvîna Bîranîna Necmettîn Buyukkaya

## Kovara Helwest


Li Stenbolê 14 saliya şehîdkirina Necmettîn bi civînek hat bîranîn. Wek têt zanîn Necmettîn di 23'ê Çile'yê de di zîndana Diyarbekirê de hate şehîdkirin. Civîna bîranîna Necmettîn ji alî MED - KOM'ê ve hate amadekirin. Di civînê de li ser jiyan û têkoşîna Necmettîn gelek axaftin hatin kirin.

Pêşî jina Necmettîn, Cemîle Buyukkaya axifî. Cemîleyê got : "Necmettin jiyana xwe dabû têkoşîna şoreşgeriyê. Ew mirovek bi dîsîplîn bû, parvekar bû. Ew gul û kulîlka çia bû. Di zîndanê de xwestin van gul û kulîlkên ciyan jêbikin, biçilmisînin, lê bi ser neketin."

Ahmed Zekî Okçîoglu û Umûd Firat ji li ser sexsûyet û têkoşîna Necmettîn axaftiyan. Axaftina dawîn ji alî keça Necmettîn Serdil Buyukkaya ve hate kirin. Serdil'ê got : "Bavê min şoreşgerekî mêrxas bû. Ew ji mirinê neditirsiya. Lê me wî zû wenda kir. Bavê min çawan hate girtin hêj jî ne diyare, girtina wî ji aî me ve nehatiye pêşkavtin. Yan bi tesaduf û yan jî bi plan hate girtin. Çend roj beriya şehadeta wî serbaz Ahmed Kahraman ji bavê min re dibêje "em dê te bukijin" bavê min jî bersîva wî dide, dibêje: "Ez ji mirinê natirsim. Hûn dikarin min bukijin. Kuştina însanan meslegê we ye. Hûn dikarin hemû tewir xirabî bikin. Lewra hûn ji hemû tiştên însaniyetê bêpar in. Hûn min bukijin jî, nekujin jî dê roj bê însaniyet we bi nefret bi bîr bîne. Hûn dixwazin min bi mirinê bidin tirsandin, heger ez bitirsiyama min şoreşgerî nedikir....."

### Portre

Necmettîn Buyukkaya di sala 1943'an de di gundê Siverekê -gundê bi navê Karahan- de ji dayik bû. Dibistana pêşîn û ya navîn li Siverekê, lîseyê di Adanê de xwend. Di salên 1966 - 71'an de li Stenbolê di Unîversîta Huquqê de xwend. Ji bo ku lê hate gerandin dibistanê neqedand û dev jê berda. 20 sal jiyana wî ya şoreşgerî di nav tevgera siyasî ya Kurd de derbas bû. Necmettin ji bo Kurdistana başûr jî gelek kar û xebat kir, ji YNK'ê re gelek xizmet kir.



Necmettîn di sala 1982'an de li Diyarbekir hate girtin. Wî gelel şkence dît. Di berxwede da. Di zîndanê de jî beşdarê hemû çalakiyên berxwedanê bû. Di 23'ê Çileya 1982'an de di zindana Amedê de hate şehîdkirin. Kovara HELWEST jî vî şehîdê nemir bi bîr tîne.

# BERXWEDANA 1984AN
# Û
# KUŞTINA NECMEDÎN BUYUKKAYA
## - 2 -

Laleş Qaso

**Ez ji Helwestê hêvî dikim ku nivîsa min sansor neke. Çimkî şêfê wê xwe sosyalîst dibîne, û ez jî dibêjim ku di sosyalîzma Marks de cihê welatparêzên kurd heye. Yanî miliyetçî jî di dîwana kominîstan de wek ku dixwaze dikare bîr û baweriyên xwe bîne zimên.**

Bi rastî em di demek wilo de dijîn ku, "ser me bûye Allah! " û "bin me jî bûye neûzûbîllah! "

Di terbiya kurd û kominîzma Marks de hevalbendiya digel leşker û polîsan, yanî hevalbendiya digel Tirkî, Sûrî, Îran û Iraqê bi kurd re îxanet bû! Belê mixabin îxanet bûye siyaset û taktîk îro.

Di civata kurd û kominîzma Marks de cihê bêbext, hevalkuj, şelaf, tirşikçî, derewçî û berdoşekçiyan tune bû. Belê mixabin hevalkujî, bêbextî, şelafî, tirşikçitî, derewçitî û berdoşekçitî bûye siyaset îro.

Li gor zihniyeta kurdên ganêre û Marksê ewrupî, di şerê kozik û çepelan de rev hebû. Belê ev rev heta kuderê bû? Hin rêxistinên kurdan kozik û çepel berdane û habela direvin. Navê revê bûye siyaset.

Siyaset bi geragup yanî min ne dît, min ne bihîst, min xwe ker kir, min deng ne kir an jî bi lavlavk û helahela yabo qurbano, nabe. Siyaseta li ser esasê tirsê mirov dike derewçî, carna dike berdoşekçî û tirşikçî û carna jî dike revok e. Organîzasyonek xwedî wilo zihniyet, wê nikaribe baş bifikire û sênga gewr û boz bibîne. Di roja ku me kuroyên kurd li zindanê qîma xwe bi pevçûn û berxwedanan aniye, em wek insanekî normal fikirîne û me pêşiya xwe dîtiye. Di vî warî de psîkologan bi sedan kitêb nivîsandine. Zanista psîkolojiyê bi xwe ev e. Tirsonekî maka malxerabiyê ye. Tirsonekî bûye siyaset! Ev çi exlaq e!


Di felsefa Marks de hertişt çimayek xwe û di bin her çimayekê de pir sebeb hebûn. Yanî ez bi xwe ji danheva sebeban hatibûm dinyayê û ezê dîsa bi van sebeban hem jiyabama û bimirama û hem jî bûbama sebebê gelek gelek tiştan bi hawayê çêkirinek din. Bawer bikin ew cesareta ku ezê bikaribim zalimê herî mezin mahkeme bikim, tucarî bi min re çênebû. Ev yeka ha jî hemû ji ber van çimayan. Yanî ezê lê bikolim bê çima ev zalim wilo ewqasî zalim bûye? sebebên vê zalimtiyê çi ne?

Eger hebe tiştekî miqedes ew jî keda wî insanê ku bi deh salan mal û canê xwe di ber doza kurdî de feda kiribû. Çima ev insan ji nişkê de tê kuştin? çima dev ji wêqas xebata xwe berdide û direve? sebeb çi bûn? çima dibetile û rûdinê? sebebê rûniştinê çi ne? çima nikare bi rehetî bipeyive? çima ez van gotinên ku xwedan jê aciz dibin, dikim? Gava mirov heraqê pevçûna mehmetçîk be, îcar çima wê ew ben li ber mirov hebin ku mirov wê nikaribe dîtinên xwe bîne zimên? Partî çi ye? Di partiya burjuwazî an kominîst de organên bilind bi çi hawayî tên damezirandin? çima tu xwe hînî ku her organ selahiyeta xwe çi ye nakî? tu çima wan selahiyetan nikarî pêk bînî? Gava ez û te em her du kominîst bin û min li gora rêbaz û destûrên partiya kominîstî bi te re kir, îcar çima tu ê min bikujî? çima xwedan teriya bi mirov vedikin? ma rastiya vê teriyê çiqas e gelo? çima mirov hinekî li wî gunehkarî guhdar nake bê ka ew çi dibêje? çima navê wî dibe xayin û filan û bêvan? sebeb çi bûn? Gava navê te Bozo û ê wî jî Soro be û Bozo bi her hawayî wek Soro

www.arsivakurd.org

fikirî, îcar çima Bozo heye? çima tu meselê tam fêm nakî û tu êrîşî ser dikî? û hwd. Hin kominîstên me tucarî hînî vî aliyê felsefa Marks nebûn. Û bi navê kominîstên herî mezin jî bang xwe dikin! Wilo kominîstî bi kêr nayê.

"Di pey ku şer qediya hûn dikarin me rexne bikin!" Yanî çi! îcar gava ku qedandina şer bi qedandina mirov qediya, wê mirov çawa bikarîba rexne bikira? ma ne ji xwe. Ji xwe kesek li holê ne dima; mirov wê kî rexne kiriba! Di kominîzma ewrupî yanî a Marks de tiştekî wilo tune ye. Troçkîstan, bolşevîk, menşevîk û anarşîstan ji sala 1912an heta 1917an bi rexne û filan û bêvanan hevdu şerpeze dikin. Û di tarîxa şoreşgerên rûsî de salên herî zor ev çend sal bûn e. "Em di şer de ne nepeyivin!" Ev yeka ha di islamîzmê, katolîzmê, nasyonal sosyalîzmê û stalinîzmê de heye. Têra xwe xerabiyê bike, mirovê ku li himber nezanî û xerabiya te derket serî hilqetîne û dûra jî "özeleştirî - xwerexnê" bide. Ma çi xem e qey(!) Tiştên ku Xwedê jê aciz e hemiyan bike û dûra jî here hecê istîxfara xwe bîne!"wê Xwedê te efû bike!" Ev çi heq û hiqûq û edalet e! "Nepeyive! tu miliyetçî û kuçuk burjuwazî yî!" û hwd. Di kominîzma Marks de tiştekî wilo tuneye. Li gora kominîzma Marks a di şertên Kurdistana îro de, çênabe ku kominîstên kurd du elfaban bi karbînin. Belê ên me bi kartînin. Û gava tu li dij vê çewtiyê derdikevî "zimanê xwe dirêj neke!" dibêjin. Baş e emê jî zimanê xwe dirêj bikin. Û hema çi ji we tê texsîr nekin. Marks qebûl nake ku kominîstên kurd bi temamê rêvebirên kurd re tifaqiyê nekin. Belê kominîstên me tew îcar nikarin tifaqiyê digel hevûdin bikin. Û gava tu ji wan re,"eger kominîstî ev be ez ne kominîst,"dibêjî, li devê te dixînin. Baş e li devê me xînin ka bê emê hîn jî di kurê re derkevin. Di enternasyonala Marks de ji her celebî insan hebûn. Belê ên me nikarin kurdekî miliyetçî tahmûl bikin. Dema ku tu ji wan re dibêjî, Kurdistan di "kirîz teorisî"de fetisî, vê kirîz teorisiyê hinekî li Tirkî jî bi karbînin; mehmetê misilman parlamenter, nivîskar, dengbêjên wek Mirado û rojnamegerên kurd dikuje; îcar bila mehmet jî bi parlamenter, nivîskar, dengbêj û rojnamegeran bersivê bistîne..." Kominîstên me bi van gotinan xwîn vedirşin û didin ser pişta te. Ji dû te venagerin heta ku te di toto re yanî di terefê dinyayê re dernexînin! Eger bi rastî kominîzm ev be, ne tiştekî baş e divê mirov dev jê berde. Di kominîzma Marks de kongre organê herî mezin û dûra jî mezinê partiyê û temamê welêt komîta merkezî bû. Belê ên me tiştekî din kirine. Gundî nikarin bibin kominîst. Berî kominîstiyê şexsiyeta tebût tê. Li gora Marks insan heta ku neba demokrat û efendî, wê nikarîba ruhê kominîstî bistenda. Belê hin ji me bêku bibin demokrat, efendî, kubar û mîrza, dikarin bibin kominîstên herî mezin. Kominîst li himber lênerînên dijber xwedî tolerans bûn qaşo. Ên me jî xwedî tolerans in. Di kovar û rojnamên wan de mirov di nav lênerînên cur bi cur de diteqinine. Me kominîstên kurdan bi hawayê tirkî kominîzm xwend. Yanî me bermeqlûb xwend û bi karanî. Mixabin ezê zêde xwe bi nav de bernedim da kominîstên me êrîşî vê kovara ku yekcarna bi sînor rê dide nivîsên min, nekin. Ku em dîsa vegerin ser berxwedana girtîgehê:





Hêsîran derî li ser xwe asê kirin, dest dan hev û xwe li hev pêçan. Dizanîbûn bîstek din wê çawa bahoz û boran li wan bide der.

"Türk dağdir devirir! Türk kasirgadir da□itir! Türk firtinadir bitirir! Türk seldir yutar! Türk denizdir batirir! Türk rüzgardir uçurur! Türk tank gibi ezer geçer! Türk, kahpe yunan› denizde siker! Amcık Ermeniyi ayakta yapar! Orusupu Yahudiyi yatakta koyar!Pis Arabı yolda yırtar! Len götü kalkmış Kıro! En büyük şey nedir! Türktür komıtanım! Yalınız o mu lan yarak! ...hadi çabuk çabuk söyle yoksa ananin .. a..na uçakla girer helikopterle çıkarım! Ulan Nebil Farac ‹rakl› göt çabuk andımızı oku! 'Ya hebîbî willehilezîm bilmîyor tirkî!'- Kes lan bileceksin işte! - 'temamdir qomitan Nebîl bîlecek: Tirk mezbut, tirk çalişqan, tirk boqsor, tirk güleş, tirk fitbol temam qomitan!- Neresi tamam bunun orusupu çabuk

www.arsivakurd.org

söyle yoksa yedim seni! Temam yême qomitan Atatur baba, Allaha Allah..! Tirk teyare, tirk cêşilmuezzem, tirk muhemmed, tirk adem, tirk Allah! Tirk Ataturk! Ne mutlî türk diyene qomitan..! Tirk bahoz e! Tirk boran e! Tirk lehî ye! Tirk birûsk e! Tirk volkan e!.."
Eeeehhhhw de were û îcar safî bike!!! tirk ji me kuroyan re ez ev im gotibû. Bahoz, boran û lehî dijminê insên û heywên û siruştê bû. Kuro jî însan e û ketiye ber bayê van afatan!



CAN

Pêşî bi tengan dora girtîgehê zeft kirin, dûra helîkopter firandin, dûra jî bi sedan mehmetçîkên misilman hatin û xwe li derî û pacan qerase kirin; derî û pace şikenandin û ketin hindurê qawîşan. Di hindurê qawîşan de kuroyên "kafir" û mehmetçîkên misilman bi kîn xwe dadan hev û di hev re firiyan. Di hev re firiyan belê çi fêde. Kuroyên birçî û tazî û bêçek ma wê çawa bikarîbana mehmetçîk bidana ber sêngê û şîş li ser şîşê di vê sênga teres de biçikanda! Hemû ketin bi qêrîn û di nava gola xwînê de gevizîn! Mehmet pêl serê wan dikir û dikeniya. Tîqtîqa wî bû tereso! Ê ne we ne dît bê çi ken dikir çi ken! Ew kenê wî bi serê xwe êşkencek mezin bû ji xwe! Kuro jî ji taqet ketibûn nema dikarîbûn li berxwe bidana. Îcar ji wahca nava xwe, bêkesî û hêsîriyê potîna mehmet gez dikirin. Wey mala min! Pevçûn!

Dîsa ezê bibêjim ku van mehmetçîkan, tiştek erê tiştek ne maye ku di serê me kuroyan û insaniyetê de ne kirine! Mehmetê misilman li pêş çavên min li tuxaya Mêrdînê bazdane ser jina kurd. Hewar hewarê wê di felekan re derdiket! Mesela kurd êdî nema bi lavlavk û yabo qurbano dimeşe. Tekoşîna bi hawayê demokratîk li himber sazûmanên miletên têgihiştî, mîrza, kubar, efendî, ganêre û xwedî qanûnên demokratîk dibe. Rêxistinên me ên aştîxwaz, têgeha demokratîk mîna kominîzma xwe ew jî çewt fêm kirine. Miletê tirk û dewleta xwe çi ji demokrasiyê, insaniyetê û hwd. fêm dikin! Kominîstên me hîn jî tênegihane ku panislamîzma tirk wê tucarî bi berger û lavlavkê hedayet nebe. Kurd, yûnanî, ermenî û yehûdî bila baş bizanibin heta ku mehmetçîk wek artêş hebe, wê kesek ji wan nikaribe li qûn rûnê. Mehmetçîk rêvebirê emperyalîzma islamî ye. Hebûna mehmetçîk îlana şer e! Emperyalîzma bi islamî bêku mirov serî biperçiqîne tucarî hedayet nabe. Rêxistinên kurd êdî divê hinekî vê rastiyê bibînin, siyaseteke kurdistanî bikin û dest bavêjin çekan. Pantirkîzm emperyalîzma bi islamî ye û emperyalîzma islamî jî pir hov û har e! Bi terbiye nabe. Her tirkê misilman xwedî wilo zihniyet e. Hedayet nabe. We hîç tirkekî misilman dîtiye ku bûye hevalê kurd û li ser kurd serê xwe şikenandiye? Ên ku bûne hevalên kurd hemû jî nemislim bûne. Girîng e ev! Xebata bi metodên demokratîk daxwaziya min e jî. Belê tirk fêm nake. Ez jî dixwazim bibim birayê tirk, belê ew qebûl nake. Min gundî xwe dibîne. Gundî nikarin bibin birayên bajarî dibîne. Gundî nikarin bibin birayên bajariyan, şîretan li wan bikin û wan bikin efendî. Em kurdên ku têr nan naxwin tew emê îcar dersa zilamtiyê bidin tirk ha(!) Ez jî partiyek xef naxwazim. Hîletê min ji partiyên xef diçe. Belê tirk rê nade ku ez wek yekî kurd bikaribim bi nasnava xwe heşkere siyasetê bikim. Dema ku zor pê hat û realîta kurd qebûl kir jî, eger kurd bê artêş be, kurd wê tucarî nikaribe kurdayetiyeke bi namûs bike. Yanî tirk wê destê xwe ji pêxêla kurd nekşîne, kurdan bi hev kuştinkirin bide, miletê kurd ji hêz bixîne û hwd. Tirkan yanî dewleta mehmetçîk, li girtîgeha Diyarbekirê jî realîta kurd qebûl kiribû. Belê bi hawayê ku her roj êşkencê bi girtiyan bike, hinekan ji wan bike cahş û wan bîne himber hev, qebûl kiribûn.

Ez jî dixwazim wek kurd bi arîstokrat, burokrat û sermayedarên tirk re dostaniyê deynim. Belê tirk tiştekî kurd qebûl nake. Nefretê ji navê kurd dike! Tu, nola bavê Kamûran Înan Şêx Selahedîn û biraziyê Seyid Riza Rêber bibe zilamê wî jî di dûmahîkê de te celî dike û dikuje. Yanî em jê re bibin xayinên xwe jî fêde nake! Çima em fêm

nakin ku terbiye û karekterê artêşa miletekî çi be, terbiye û karekterê wî miletî jî ew e! Artêş bi xwe milet e. Bi navekî din artêş îfadekirina milet e. Mehmetçîk karekterê miletê tirk e. Karekterê artêşê çi be ê milet jî ew e. Artêş û polîsên ewrupî û miletên wan, artêşên efrîkî û miletên wan, pêşmergên kurd û kurdan bidin berhev hûnê bibînin ku karekter û terbiya wan yek e. Ev ji çi tê? Ji milet tê! Mehmetçîk nexweş e ji ber ku miletê wî bi xwe nexweş e. Gotineke giran dibêjim belê rast e. Gava ku Hîtler bi milyonan insan dikuşt û davêtin firinan, miletê eleman bêwestan dixebitî; xwarin, çek û cebilxane pêşkêşî leşkerên xwe dikirin. Miletê eleman gunehkar bû yanî nexweş bû; karkerê eleman dest bixwîn bû yanî nexweş bû; xelkê eleman bûbû eşqiya ma ne wilo bû qey! Elemanan ew wahşeta leşkerên xwe ne didît gelo? Ew leşker kî bûn? Artêşa tirk agir li Kurdistanê dibarîne, miletê tirk vî agirî nabîne gelo? Ji bo ku mirov di zilmê de bigihê pêwîst nake hin mirov perwerde bikin. Zilm agir û dûman e; heta bi zarok û dêhnan jî dibînn. Zaroyên"Meşhur türk proleteryası, büyük türk halkı ve yüce türk mılleti" mehmetçîk, Kurdistan wêran kir! Hûn nikarin artêşa mehmet li aliyekî û milet an jî karkerên tirk li aliyekî deynin. Mehmet bi hoqeboq û kêf û seyranan pazdeh sal e ku bêyefş agir li ser Kurdistanê dibarîne! Wahşeta zaroyên şeqalan yanî seyar satıcı, gundî û beqalên tirk bêhed û hesab bûye! Van zaroyên xelkê tirk, hema bibêjin temamê miletê kurd di sintaqa êşkencê re derbas kirin! Her gund û bajarên kurd kirine wargeh û di van wargehan de hinavên kurd diterişînin! Ji bilî komînîstên kurd temamê dinyayê vê hovitiya miletê tirk dibîne. Komînîstên kurd ewqasî nezanin bê bêlome be! Li Stenbolê, ızmîrê û hwd. bi deh hezaran kurd derdikevin sikakan dewletê şermezar dikin û ên me jî mîna ku ev insan hemû tirk û dostê kurd in, rastiyê nabînin û dinyaya xwe bi xeyala"Türk - Kürt kardeştir" rengînî dikin(!) Ew ji bîr dikin ku li Tirkiyê dezgehên wek"insan hakları dernek ve kuruluşları" û hwd. hemam hema bibêjin hemû ji teref kurdan saz bûne. Tirk bi miletî hîn nebûye zilam. Divê em nav lêbikin daku em bizanibin bê emê çi bikin. Û heta ku ew misilmantiya xwe bi tirkî bike ewê tucarî jî nebe zilam. Çimkî islama wî rê nade vê yekê. Çimkî islama wî ji Siltan Yavûz vir ve, dewlet di mejiyê wî de Xwedê û artêş jî pêximberê vî Xwedayî bi rûniştkirin daye ji ber hindê. ıslam îdeolojiyek e. Îcar îdeolojiya ku bi sed salan di jiyana milet de wek kultur cih girt, ew milet zû bi zû wê nikaribe xwe ji wê kulturê dawerivîne û hedayet bibe. Miletê tirk nikare bibe dostê kurd. Ji ber ku islama wî rê nadêyê nikare bibe. Dibe ku îro li temamê Tirkiyê sê, çar hezar dostên kurd tirk hebin, belê ev jî ne misilman in. Di islama tirk de hîç belê hîç cihê kurd tuneye! Kuştin û talankirina kurd ferz dibîne. Di tarîxa tirk de bi qasî ku îro tirk bûye misilman û dijminê kurd bûye, di tu tarîxên zemanan de bi vê ecêbê wilo misilman û kurddijmin nebûye. Mehmetçîk bûye afat! Miletê tirk bûye afat! Me kurdan gotinek heye dibêjin;

"Hetanî deve bimîne heywan, ereb û romî nikarin bibin insan!" Pêşiyên me bi derewan ev gotin ne kirine. Şerha vê gotinê ev e. Yanî pêşiyên me dibêjin ku:
"Me li himber ereb û romiyan bi sedsalan'demokratîk-barışçıl mücadele' da û ereb û romiyan jî herwiha bi devê tivingê em bersivandine. Dev ji kar û xebata aşitiyê berdin!"

Li dor 700 - 800 salî çêbû ku em kurd, "demokratik-barışçıl mücadele" didin. Li Kurdistanê labratuwarek nema ku ev teorî tê re derbas ne bû. Teorî ji serî de qelp derketî ye çavên min; ji serî de derb li doza kurdî xistiye û bûye problem. Bi kêrî me nayê bavêjin û zendên xwe ji şer re vemalin! Kirîz teorisiya komînîstan hema ji bo demek kin be jî gerek li Tirkiyê bê bi karanîn; daku israheta karker, xelk û miletê tirk xerab bibe; daku fêm bikin bê koçderî, xerîbî, parsekî, kuştin û şewt û malwêranî çendî zore!! Da fêm bikin ku bi rastî ev kurd jî insan e. Yanî mejiyê wî, dilê wî, kezeb, hinav, çavên wî û hwd. hene. Û ew jî wek wan dikare bikene, bigirî û bifikire.

Çov ji çov vedigere. Dêh dêhn dibîne debûzê xwe di bin qêpût de vedişêre. Mehmetçîkê misilman û bav û bapîrê xwe ji vê fêm dikin. Heta ku bi miletî bêvila tirk neyê firkandin, dewlet wê tiştekî kurd qebûl neke. Heta ku bi miletî jiyana tirk serûbinî hev nebe, ewê tucarî destê xwe ji xwîna kurd nekişîne! Bêvila tirk hîn ne hatiye firkandin mixabin. Baştir e ku ez vê meselê di vir de qut bikim daku komînîstên me êrîşî min nekin. Çimkî ez,"iki büyük kardeş halkın düşmanlığı"dikim ya. Ez ji Helwestê hêvî dikim ku nivîsa min sansor neke. Çimkî şêfê wê xwe sosyalîst dibîne, û ez jî dibêjim ku di sosyalîzma Marks de cihê welatparêzên kurd heye. Yanî miliyetçî jî di dîwana komînîstan de wek ku dixwaze dikare bîr û baweriyên xwe bîne zimên.

**Dumahîk heye**

# ADARE

## Lezgîn Saleh

Dema ku behrên di nav ewran de
Zincîrên koletiya xwe qetandin,
Û wek tayên hevrîşîmî;
Ji ezmanan hatin xwar;
Û xeyilya bûkê li ser riyê wê rakin
Û tîrêjên rokê yên evîndar
Giha ewîndara xwe; himêz kir
Û ramusanekî ji dil
Ji lêvên xaka evîndar stand
Wê hingê adare
Wê av li daran bigerê
Xaka aviz;
Wê di nav qolincên hamla xwede
Bigevizê;
Di gevzandina xwede xak
Sing û beden vekirî wê bizê
Wê hingê berê xwe bide dinê
Wê çawa şehrezaniyên xwe
Nîşanî me bikê
Newroz li qazûqederê
Siwar
Li gel stranên azadiyê
Wê reng û dengê xwe bidê
Wê demê
Wê li ber awazê senfoniya
Şehlîl û bilbilan
Bi sedhezaran
Gul û gulşeng mil bi mil
Bikevin govendê.
Wê demê
Wê ji sedhezar deveran
Sedhezar penç
Dagirtî bi sedhezar rengên
Konfentiyan
Li ser serê govendvanan belav bibê.
Bîst û yekê adarê
Wê cîhan seranser xemlandî
Li dura keça Kurd Newroz
Serbest û azad
Ji hişê xwe herê
Wê rojên tarî herin
Rojên ronahî li her deverê
Li gel sosin beybûn û nêrgizan
Bidin bêhna misk û amberê.

www.arsivakurdi.org

# Zanîna Zimên
# BIRÊ MORFOLOJÎ

## 1

Pervîn Şerefnaz

Beriya ku ez dest bi şiroveya xwe bikim, divê maneya morfolojî çiye? bersiva wê bidim. Morfolojî; hînbûn û hînkirina cûrên bêjeyan e. Ew, guherîna bêjeyan şirove dike. Bi çi awayî bêje çêdibin û bi alikariya kîjan tiştan bêje çêdibin, şirove dike.

### BÊJE: (PEYV, XEBER, GOTIN)

Weke ku min li jor nivîsî ji bo bêje gelek navên din jî têtin gotin, lê ez dê her bêje bibêjim. Baş e, bêje bi xwe çi ye?

**BÊJE:** Meriv ji bo diyarkirina daxwazên xwe, hevokan bikartînin, hevok bi xwe jî ji yekîtî û konabûna? bêjeyan çêdibin. Wek;
Ez diçim malê.
Ev ji hevokan numuneyek e. Lê ji çar bêjeyan pêk hatiye.
Bêje hin caran bi serê xwe dikarin maneyekê bidin, wek; Nan, sol, gulîlik.
Bêje hin caran jî nikarin bi serê xwe, maneyekê bidin. Wê gavê, bi alîkariya hin bêjeyên din dikarin maneyekê bidin. Wan bêjeyan wek; Li, di, de, ve, re. (Osman Sebrî van daçikan di nav bêjeyan de nabîne)

### A) BINGEHÊ BÊJEYAN:

Heger em ji aliyê dengan li bêjeyan binêrin, em dê bibînin ku bêje ji deng û kîtan çêbûye. Lê dema ku em ji hêla babetî (şeklî) li bêjeyan biner-in, dê bibînin ji kok, paşkok û pêşkokan çêbûye.

BINGEHÊ BÊJAN:
a - b - d - s
Deng:------------------------------------
A-gir, Nan,
Kite:--------------------------------------
xweş, can, nav
Kok:--------------------------------------
Ber, Bê, Ne
Pêşkok:----------------------------------
Ik, ok, dar
Paşkok:---------------------------------

Piştî ku em bi kurtayî li ser bingehê bêjeyan sekinîn em ê îcar bi şîroveyî li ser bisekinin.
1)- **Deng:** Me berê jî gotibû ku ew hîmê zimên e û em dengan bi tîpan didin xûya kirin.
2)-**Kîte:** Ew dengê ku bi vekirina devê me, ji devê me derdikeve û dibe kîte, we; A-loz,- li vir em du caran devê xwe vedikin, ji ber ku ew ji du kîtan çêbûye.

**3)-Kok:** Di nava bêjeyekê de, ew aliyê ku êdî perçe nabe, dibe koka bêjeyê, kok ji ber ku perçe nabe jî maneya wê her dem heye. Wek;
Zêrîn--- zêr li vir kok û bi mane ye.
Berx+ik-- berx li vir kok e û bi mane ye.

Kok jî ji awayê maneya xwe dibe du beş;

a)-Navdêr; Zêr+în-- zêr, kok e û ji nav pêk hatiye.
b)-Lêker; Rê + bir--bir, kok e û ji lêker pêk hatiye.

a) NAVDÊRÎ: Hinek kok hene ku di nav xwe de, navê tiştên bi can û bê can dinimînin, ji bo wan jî navdêr têt gotin, wek;
Mal, can, kevir

b) LÊKERÎ: Hinek kok hene ku di nav xwe de hew tevgerê dinimînin, ji wan re jî lêker tête gotin. Wek;
Mêr + kuj, rê + bir, ve + xwarin

**4) PAŞKOK:** Paşkok ew bêje ne ku, bi serê xwe nikarin mane bidin, dema ku tên dawiya kokan bi mane dibin.
Em ji bo ku kokan bixin nav kar û ji wan gotinên nuh peyde bikin, ji paşkokan destkewtî dibin, wek;
Sorsor+ik. Sorsorik (ik) li vir paşkok e.

**5) PÊŞKOK:** Pêşkok bi xwe jî bi serê kokê ve dizeliqe û fikra wê bêjeyê diguherîne wek;
Bê + mal, ber + malî û ên din.

C.B.

**BÊJE:** Ramanek e, ku ew hin caran şikilekî û hin caran jî manakêtîne pê. Ew her du awayên fikirê bi bêjeyan têtin eşkere kirin. Em dikarin bibêjin ku, her bêje, nimînendeyê fikirekê ye wek; dereng, hesp, reş, wan, hatin, jê-re, digel, ez, hevraz, berwar, mehder.

**BIRÊN HEVOKÊ:** (QISET) Bêje li gor mana û dehkerên xwe ji hev cihê dibin. Birekî wan mirov, heywan û tebaniyê nerihber yên ku bi dest têne girtin yan jî dikevin ber bînahîya me, şanî me dikin. Birekî, din, tiştnê welê pêş me dikin ku ew bi dest nayine girtin, lê di bîr û ber çavên me de radibin. Ji alîyê din, bêjenê welê hene ku bi serê xwe nikarin tu tiştekî raver bikin, lê gava bi bêjeyên din re dibin û dikevin navbera wan, mana wan diedilînin, dibin serî û wan bi hav re girêdidin. Ji lew re, bêje, di her zimanî de, li gor mana xwe û li gor karê ku ew pêktîne, dibe çend bir, ji bo wan dibêjin birên hevokan (qisetan).
Di zimanê Kurdî de, birên qiseta deh in; navder, veqendandek, rengdêr, pronav, lêker, jimarnav, hoker, daçek, gihanek, baneşan.
Birên gistê ji hêla guharbarîya xwe dibin du bir; guhêrbar, reguhêrbar.

*a* Bêjeyên guherbar: Bêjeyên guherbar, ew in ku di hevokê derewşa xwe ya rastî diguherînin û xwe ditewînin. Ji birên hevokê 5 heb xwe ditewînin ango guherbar in. (a)navdêr, (b) veqentandek, (c) pronav, (d) jimarnav, (e) lêker.

*b* Bêjeyên neguhêrbar: Bêjeyên neguhêrbar ew bêje ne ku, di hevokê de rewşa xwe ya rastî tu caran naguherînin her wekî xwe dimînin; (a) rengdêr, (b) hoker, (c) daçek, (d) gihanek, (e) baneşan.

**(B) JI HÊLA MEENAYÎ BÊJE:**

Piştî ku me ji alîyê avanîya bêje dîtinên xwe gotin, îcar ji alîyê meena em ê li bêjeyan binêrin. JI hêla meena bêje di nav xwe de dibe heşt biran;
1- Navdêr
2- Rengdêr
3- Pronav



www.arsivakurd.org

4- Lêker
5- Daçeka nîr
6- daçekên pêrbest
7- Daçekên pêwênd
8- Bang

Emê di bira meenayê bêjeyan de ev heşt libên jorîn bivînin û li ser wan rawestin. Nuha dixwazim dîsa derbasî ser avanîya bêjeyan bibim û çêkirina bêjeyan şîrove bikim.

## ÇÊKIRINA BÊJEYAN:

Bêje di nav wxe de dibe du biran;
a- Bêjeyên xurû
b- Bêjeyên çêkirî yan jî hevdudanî.

**A-BÊJEYÊN XUR:** Bêjeyên ku ji yek gotinê pêk hatine, dibin bêjeyên xurû, wek; hesp, dar, av, mêr.

**B- BÊJEYÊN ÇÊK‹RÎ YAN JÎ HEVDUDANÎ:**

Ew bêjeyên ku bi alîkarîya çend pirsan yan jî paşkok û pêşkokan, çêdibin, dibin bêjeyên hevdudanî wek; sîr+dim, mêr+xas, bê+mal.

**BÊJEYÊN ÇÊKIRÎ:**

Ew babet bêje jî di navbera xwe de dibin du biran,
a- Bêjeyên hevbend
b- Bêjeyên bi paşkok û pêşkok

**BÊJEYÊN HEVBEND:**

Navên hevbendî pirsên hevbend ji du navan çêdibin, wek;

| | |
|---|---|
| mar+masî, | sîr+dim |
| ker+guh | guh+dîk |
| serp+êş | dest+nivîsar |
| jin+bira | kur+ap |
| kur+xal | mal+bav |
| cî+nav | cî+war |
| dê+bar | av+sîr |
| sîre+mast | jar+mar |

Bêjeyên hevbend ên ku ji yekîtîya rengdêr û navdêran çêbûne.
Bêjeyên ku bi rengdêr û navdêran çêdibin,

....................?....................;

a ) navdêr berê, rengdêr dûre têtin nivisandin û rengdêrên nuh çêdibin, wek;

| | |
|---|---|
| mêr+xas | mêrxas |
| kum+sor | kumsor |
| bext+reş | bextreş |
| kum+reş | kumreş |
| kêf+xweş | kêfxweş |
| dil+sar | dilsar |
| ser+hişk | serhişk |
| guh+dirêj | guhdirêj |
| çav+reş | çavreş |
| mal+ava | malava |
| pez+kûvî | pezkûvî |
| rû+nerm | rûnerm |
| can+giran | cangiran |

b)Awayê duyim,; berê rengdêr pişt re navdêr têt nivîsîn û rengdêrên bi vî awayî çêdibin, ewk;


| | |
|---|---|
| sor+gul | sorgul |
| pîre+jin | pîrejin |
| xas+mêr | xasmêr |
| pîre+dê | pîrdê |
| xweş+mêr | xweşmêr |
| bed+bext | bedbext |
| şor+av | şorav |
| qelse+mêr | qelsmêr |
| dûr+bîn | dûrbîn |

www.arsivakurdi.org

# Karê Edebî Asoyê Mîrovan Vedike

Adil Duran

Pirtûkek bi navê "Rewşa Edebiyata Kurdî / Cîld -1" Lokman Polat amade kiriye. Di naverokê de hevpeyvîn bi nivîskarên Kurd re hatine çêkirinê û di nav weşanên Çanda Nûjen de, di sala 1996'an de çap bûye.


REWŞA EDEBÎYATA
KURDÎ
Bi nivîskarên Kurd re
HEVPEYVÎN
Amadekar
Lokman POLAT
Ji bo
GULVEDANA
EDEBIYATA KURDÎ
Dîtinên Nivîskarên Kurd
CÎLD ☞ 1
Weşanên Çanda Nûjen
(Modern Kultur Forlaget)

Bi taybetî li ser rewşa wîje (edebiyat) a Kurdî lêger û lêkolîn nîn in.! Lê nivîsarên rexnegirî û yên danasînên pirtûkan di gelek kovar û rojnameyan de tên nivîsandin. Va ye çend salin li Swêd tevger û xebateke berçav heye û bi kurmancî, dimilkî, soranî gelek berhem tên afirandinê. Demê ku meriv bixwaze bi regezên wîje yî vanan ji hev derînê kêmasî û hêjayî ya wan jî bivê nevê gere daynin ber çavan. Lê mixabin xebateke demdemî ye, bê desthelatîye û sehêtî nîn e...!

Li Swêd bêtir, bandureke xas nade derveyî Swêd. Pirtûk nagîhin gel, zêde di nav civakêde belav nabin û nayên xwendinê. Di nav yên bijarte de tên û diçin. Bi raya min be: divê ji van tixuban derbazî herderê bibin. Çapkirin û firotina pirtukan gelek giran e. Yek jî divê sehêtîyek xurt hebe, demê ku nîvîskarek berhemê xwe diafirînê hê ku nedaye çapê divê çend kopîyan ji rojname, kovar û pisporên ku xususî li ser wan mijaran radiwestin, ji wan re bêne Şandinê. Da ku di wê qonaxê de berhem bê nasîn û rexne li ser bê girtin. Ango bên pesindan, bên helanîn danîn.. Eger pîvan nebe her tişt tevlihev dibe.

Niha dixwazim vergerim li ser pirtûka L.Polat. Ji bo têgîhiştinê pêşgotinên L. Polatî gelek dirêjin (pirtûk 108 rupel e û ji sedî sî jî bal û reya xwe re kerî kirîye) Ji ber ku pirtûk hevpeyvînên ku bi 12 (diwazdeh) nivîskarên Kurd re hatine kirinê amade bûye.Wî dikarîya li wir de li ser navê xwe jî ew pirsên ku di derheqê edebîyata Kurdî de hatine kirinê bersîv lê vegerandana, lê wî di despêkê de nihêrînên xwe rêz kirîye li gor reya min ev ne rêbazek başe..

Lewra, L. Polatî wek wîjenasekî, di vê pirtûkê de dîtin û nihêrînên wîjekaran dide raya giştî. Nivîskarên me ewên kû 13 (sêzdeh) pirsên li ser edebîyata Kurdî bersîvandine raya wan

www.arsivakurd.org

gelek têkûzin.. Ji ber ku vaye bîst sale ew li durî Welêt bûne, durişmê wanan li welatên bîyanî û di nav rewşa penaberîyê da ye. Ji alî kî baş e, li van welatan wîjeyê xelkê nasdikin. ji alîyê din jî xeter e û ne di destê wan da ye, karê ku dikin jî nîv mirî ye.!

Divê nivîskar li ser bircên jîyana xwe pêşdeçûyîn û livîna civakî, guhêrînên nû û hîssên gel li gor rewşa wanan yê rojane bi lêkolîn û lêgerên zanyarî di berhemên xwe de biafirîne û teslîmî xwendevanan bike. Her wisan nebe, edebîyatek bê alîgir û bê xwendevan, bê sehîtî û bê sazuman gelek hêsan e.. Ji ber ku Wîjekar jî rewşenbîre û bi karê wîjeyî asoyê mîrovan vedike. Demê ku meriv qala Edebîyatê (wîje) dike ,wîje ne bi tenê roman û çîrok e, çend taxlît e. Edebîyat biwêjek Erebî ye û mana xwe ev e.: Bi ramanên têkûz, hîssên zexm û xeyalên bandûrkêr têgîhandinek hunerî yê ye. Destan, helbest, çîrok û herwekî din berhemên nivîsandî û devkî digire naveroka xwe. Ji bo wîje yî netewî zimanek azad wek mifte ye. Bi tenê ziman jî ne pîvanek e, jê re zanîn jî divê.Wîje, mijarên xwe ji dîrokê, ji civakê, ji durişmên şexsî heya, tebîatê bi aso yeke berfireh digire û gelek qonaxan rêgehên ciyawaz derbaz dibe.Wîjekarî wisan ne bi hêsan e, her kes nikare bibe wîjekar. Lê mixabin Swêd yên ku qelemê digirin destên xwe ziman zanin, tev bûne wîjekar! ma ne ecêb e.? Ji ber çi pîvanek ango desthelatîyek nîne? Hê hÎn tiştên ecêp jî hene; ew ên ku heya çend salan berê karê siyasetê dikirin,wan sîyaset danîn erdê û îro dest avÎtÎne edebîyatê.Wîjekar jî rewşenbîr e, lê demê ku bikaribe heqê hin tiştan bide ji ber çi na! Tiştê ku ez dixwezim vekirî bibêjim eve, sîyasetzanên me karên xwe pêş nexistin pûç kirin,vê carê jî xwe dan ser edebîyatê ew jî nîvmirî hiştin! Rexne girtin ji bo wan kar nayê, ev zû bi zû qilifekî jî dibînin û li der û dorê wan çend alîgir jî hene , rexne lê girtin hesudîye û divê meriv xwe ji Şerê wan biparêze! Dîsa jî ez di xwezim bêjim ezîtî û meslehatên Şexsî sedemek mezine û rola xwe jî dileyîze..

Bila şaş neyê fahmkirin û baş bê hînkirinê, ez naxwezim bîlasebep neheqîyê li hinek kesan bikim. Lê divê hin birç û bingehên rexnegiriyê jî bêne zanîn.Her wek çend mînakên baştirîn jî raxînim ber çavan. Sîyasetnasê hêja,wîjekar, birêz Kemal Burkay, mamosteyê mezin seyda Cîgerxwîn, Mihemed Uzun, Şêrko Bêkes, M. Baksî, Rojên Barnas, M.E.Bozarslan û gelek şexsîyetên din berhemên nemir afirandÎne. Meriv dikare berhemên wan bide ber berhemên xelkê jî. Ma pîvan heye? Bellê, çawa na!; hîssên xurt, ramanên têkûz, têgihandinek bandurkêr û hûnerî di afirandinên wan de kamil buye. Nivîsên wan di çerçeva seretayên wîjeyî de tên pejirandinê. Ma, îddîa jî ne ewe!

---

Bi taybetî li ser rewşa wîje (edebiyat) a Kurdî lêger û lêkolîn nîn in.! Lê nivîsarên rexnegirî û yên danasînên pirtûkan di gelek kovar û rojnameyan de tên nivîsandin. Va ye çend salin li Swêd tevger û xebateke berçav heye û bi kurmancî, dimilkî, soranî gelek berhem tên afirandinê.

Lewra, Lokman Polatî wek wîjenasekî, di vê pirtûkê de dîtin û nihêrînên wîjekaran dide raya giştî. Nivîskarên me ewên kû 13 (sêzdeh) pirsên li ser edebîyata Kurdî bersîvandine raya wan gelek têkûzin...

---

Min li jorê qal kiribû, êdî naxwezim zêde li ser Şîrove bikim. Şîrovekirina vî ji we re dihêlim. Zagona dîyalektîkê ye her tişt tên guhartin, divê rewşenbîrên me jî durişmên xwe bi guhêrînîn "ji bo gulvedana edebîyata Kurdî " dîtinên nivîskarên Kurd hemûyan pêwîst e. Divê L. Polatî bê nihêrînek dubendî lêger a pirsên xwe kuta bike.Wisan nebe xebat nîvçe, nîvmirî û seqet dizê...

www.arsivakurdi.org

Lewra di pirtûkê de nivîskarên me raya xwe dane pêş, di destpêkê de wîjeyekî netewî û nûjen di çerçeva hizrên demoqrasîyê de divê bê afirandinê û vedana xwe gelemperî be. Da ku gelê me baş bixwîne û şundemayîna xwe yî bi salan bikaribe biguhêrînî. Ango bihn û tahma şoreşê û guhêrînên nûjen têxe nav bircên wîje yê netewî. ji ber ku gelek hacetên şoreşê hene yek ji van wîje ye. Min qala şoreşê kir lê ev şoreşê ku hemu gelê kurd hembêz bike nîne, tiştên ku ez dibêjim, rewşenbîrên me bi hizrên çînî ango netewî berhemên xwe afirînîn, demê ku ev berhem bigîhin armancê xwe merîv dikare qala şoreşê bike! Her wekî din ew partî û sazumanên me jÎ, ji bo ronakbîran rê venakin, mecal nadin.! Nivîskar, hunermend û revşenbîrên me heya ku têkîlî ommedê partîyekî nebin hebûna van jî nayê qebulkirinê. Ji ber ku îro cÎvaka me perçe perçe ye, Kurdîstan bûye ya Mam Celal, ya Kak Mesûd Barzanî û ya Serok Apo! Em gelek ronakbîr, hunermend, nivîskar û sîyasetzan derveyî van mane û bê parin. Va rewş ne rewşeke pêşda ye û bi sedemekî mezin wisa hatîye. Rewşenbîrên me rolê xwe yên dîrokî neleyistine. Bîr û bawerîya netewî, zanyarî, hînbuna demokrasîyê, aşîtiyê, azadîyê nedane gel. Hemu livîn û tevgerên me nerît in. Rêxistinên me bi xwe bi fikrên netewî û dewletbûyînê sazuman nebûne! Terbîye û bîr û bawerîya rêxistinî di gel îddîayên mezin bêyî hîssên netewî hatÎne holê! Her wisan nebuna, ewê daxwezîya Serok Apo jî bihatana cîh û romanek li gor dilê wî bihatana nivîsandinê! Gerek e jî. Ji ber ku sêzdeh sale bi taybetî li Kurdîstana bakûr û başur gelek bûyer diqewimin, gund wêran bûne, herroj têne bombebarankirin, gelê me bi zorî hatîye koçewarkirin, mirin, kuştin, qetlîam û hwd. Gereke eva sêzdeh sal bi rêyê huner bê dagirtin. Ji pêşerojê re bêne tesbîtkirin. Ew qelemên ku derd û kûlê gel nenivÎsînî , ev qelemê kû dijî xirabîyê, zordestîyê dernekeve, ev qelemê ku xwe erzan difiroşî û Şelaf e ne tu qelem e û bila bikeve bin erdê!

Loma, di kar û barên me kurdan de sehêtî û desthelatî nîne. Em her tiştî de amator mane. Ma ev şoreşger yê ku rojê heyşt saetê xwe nede şoreşê û ev rêxistin yê ku şoreşgerên xwe xwedî neke dibe? Gelo, çend nivîskar, hunermend ango rewşenbîran xwe ji amatorî yê azad kirin e.? Mafê keda hunerê û yê nivîsê çîye? Ma tu pîvan heye?

Ger bersîvê vanan neyê dayîn em nikarin çareserkirinek ji vî halê xwe re bibînin. Ji ber ku em diniayekî daringî de dijÎn. DarÎngî mÎfte ye bi her zimanî deng dike û her derî yî vedike. Partî û rêxistin gelek tişt ji hunermend, nivîskar û rewşenbîran daxwez dikin. Qilif jî amade ye; divê ji bo şoreş û netewê cangorî bin. Fedekar bÎn. Raste, lê her daxwez beranberî hev e.
Li gor raya min, rewşenbîrên me îro pê de berhemên xwe bi plan û bernameyên zexm bikin û roleke dîrokî bileyîzin, ji ber ku ew peyîvdar û şahîdên vê rojê ne!

Pirtûka L. Polatî "Rewşa Edebîyata Kurdî" ji bo vê nivîsa min bu sedemek vekirî û piştî ku min ew xwend qenaet anî ku bi tenê nivîsek ji bo danasîna wê pirtûkê ne bese! Jê re kûr û dûr lênihêrînek divê.

REWŞA
EDEBIYATA KURDÎ
Cîld - 2
(Edebiyat
û
Zimanê Berhemê)
Derdikeve!
Weşanên
Çanda Nûjen

K. Helwest

## KONGREYA KOMELA NIVÎSKARÊN KURD LI SWÊDÊ

Di 7 / 2 / 1998'an de Li Stockholmê di salona ABF'ê de kongreya 4'an a KNK'ê çêbû. 36 nivîskarên Kurd beşdarê kongreyê bûn. Di kongreyê de rapora kar û xebatê û rabora aborî hate xwendin. Di xala munaqeşeyan de li ser pirs û pirsgirêkên komeleyê hate rawestandin. Ji bo kar û xebata komeleyê ji bo pêşerojê gelek pêşniyar hatin kirin.
Di xala helbijartina organên komeleyê de 5 esîl û 2 cîgir ji bo komîteya karger a birêvebiriya komeleyê hate helbijartin. Nivîskarên ku ji bo komîteya birêvebir a komeleya Nivîskarên Kurd hatin helbijartin ev in:

1 - Xelîl Dihokî - Serok
2 - Aram Gernas - Sekreter
3 - Lokman Polat - Sekreterê malî
4 - Hesenê Metê - Berpirsê projeyan
5 - Cemal Batun - Berpirsê Çirayê
6 - Laleş Qaso - Berpirsê Çira'yê.
7 - Teymûrê Xelîl - Alîgirê kar û xebatê

Delegeyên ji bo kongreya Federasyonê jî; Lokman Polat û Zinar Soran in.

Komîteya birêvebir di nav xwe de civîn çêkir û ji bo kar û xebatê gelek plan, proje û çalakiyên bijarte girte rojeva xwe. Di nav xebatên pêşerojê de yê herî girîng amadekirina gelek semîneran e. Li ser babetên cuda dê 6 semînerên balkêş bêne amadekirin.

## HEFTEYA KULTUR Û LÎTERATURA KURDÎ

ABF, Fedreasyona Kurd û Komeleya Nivîskarên Kurd li salona ABF'ê hefteya kultura Kurdî amade kirin. Hefteya kultura Kurdî di 2'ê meha adarê de dest pê kir. Program û çalakîyên hefteya kultura kurdî weha bû:
2'Adarê : Li ser pîrozkirina 100 saliya rojnamegeriya Kurdî panelek heye. Beşdarvanên vê panelê : Malmisanij,Eşref Okumuş û Mahmûd Lewendî ne. Piştê panelê helbestvan Ahmed Huseynî çend şiîrên xwe dixwîne.
3'Adarê : Panelek li ser "Kurdên Li Swêdê" ye. Panelvanên beşdar : Nalîn Baksî, Dilşa Demiba¤ û Keya Îzol in. Ev roj jî Şêrko Bêkes şiîrên xwe dixwîne.
4'Adarê : Panelek gelek balkêş heye. Beşdarvanên vê panelê kesên biyanî yên dostên Kurdan in. Navê panelê : Di Îran, Tirkiye, Irak û Suriyê de rewşa Kurdan. Panelvan : Îngrîd Falk -Ji Amnesty, Lîsbet Olofdoter-Ji komîteya dostaniya Swêdî û Kurdan, Urban Allîn-Ji Parlementoya swêdê.
Ev roj jî xwendina şiîran û muzîka Kurdî heye.
5'ê adarê : Teatirek gelek baş tê leyistin. Navê teatirê "Söt, Degig och Kletit" e. Lîstikvanên vê şanoyê : Mona Seilitz, Kemal Gurgu û Conny Andersson in. Ev roj panelek jî li ser sedemêm bê dewletbûna Kurdan e. Panelvanên vê panelê ev in: Kendal Nezan, Galleti Mirelle-Ji Îtalyayê û dervîş Ferho ne.
6'ê Adarê : Ev roj filma "YOL - RÊ" tê nîşandan. Paşê li ser "Ziman û Lîteratura Kurdî"ji alî Reşo Zîlan ve semînerek tê dayîn. Omer Şêxmûs jî li ser "Rewşa Siyasî ya Kurdistanê" semînerek dide. Axaftina girtina hefteya kulturî û Lîteraturiya Kurdî ji alî sînemavan Gösta Ekman ve tê kirin.

# WAR
## Kovara Lêkolîn û Lêgerînê

### K. Helwest


Kovara War hejmara sê bi naverokeke dewlemend derket pêşberê xwendevanan. Kovara War li Stanbolê bi fermî derdikeve. Kovara War bi Kurdî û Tirkî ye. Kovareke demsalî ye. Ji hêla lêgerîn û lêkolînê ve kovareke xurt e. Li ser gelek babetan curbecur nivîsên lêkolînî tê de têt weşandin. Kovar ji alî teknîk û kalîteya xwe ve jî baş e.

Kovara War dê ji hejmara çaran pêve li ser babetên cuda dosyayên taybetî amade bike. Dosyaya hejmara çaran li ser "Helbesta Nûjen Ya Kurdî" ye.

Di kovara War hejmara sê de li ser van babetan nivîs hene:

LêkolînvanTorî li ser têkiliya ziman û koka gelan rawestiyaye. Torî di vê nivîsa xwe de îdîa dike ku; ziman koka gelan nîşan dide. Fîkret Sûhrewerdî di nivîsa xwe de têkiliya Newroz û sersalê aniye ziman û kevneşopa Newrozê û bûyera Komara Mahabatê miqayese kiriye.

Nivîskara Kurd Xanim Nêrgiza Torî du beşên kitêba miqades ZEND-AVESTA ya Zerdûşt ji Îngilîzî wergerandiye zimanê Tirkî. Romannivîserê hevdem Mehmed Uzun bi zimanê xwe yê zelal û bi pênûsa xwe ya xurt, li ser pîrê dengbêjan, Evdalê Zeynikê û têkiliya ziman sekiniye. Helbestvanê Kurd Arjen Arî bi Kurdî destana Kawa nivîsiye. Ew di vê destanê de, pêlên dengê azadî û agirê Newrozê belav dike.




- Halkların kökenini dil belirler
  TORİ
- Yeni yılın mitselliği ve Kurtler
  Fikret SÜHREWERDİ
- Zend - Avesta
  İngilizcesi James DARMESTETER Türkçesi Nergiza TORİ

Kurdologê hêja, zimanzan û lêkolînvan Prof. Qanadê Kurdo, li ser nav û nîşanên Kurdên Êzîdî û Şêx Adî hin agahdariyan dide xwendevanan. Nivîseke Herekol Azîzan (Celadet Bedir-Xan) ku li ser girîngîya ziman rawestiyaye ji kovara HAWAR'ê hatiye wergirtin. Prof. Dr. Îzzeddîn Mistefa Resûl û Ebdurraqip Yûsif li ser kelepora bajarvaniya Kurdî sekinîne. Remezan Alan bi navê "Serwerê Teyran" li ser mîtolojîya Kurdan rawestiyaye. A. Uçaman û Seîd Verroj li ser ziman lêkolîn kirine. A. Uçaman li ser hostayê edebiyata Kurdî Seydayê Xanî û Mem û Zîn'a wî kurtenivîsek nivîsiye. Lêkolîna Seîd Verroj ya li ser "Folklora Kurdî" wek rêzenivîs didome.

www.arsivakurdi.org

KOVAREKE NÛ

# AMÎDA




## K. Helwest

Diyarbekir keleya berxwedana netewayî ya Kurdan e. Welatparêzekî xurt û qihîm li Diyarbekirê şîn bûye. Ji bo doza netewa Kurd bê rawestadin kar û xebat di vê bajara dîrokî a Kurdan de têt meşandin. Li gel kar û xebata siyasî di hêla çandî û edebî de jî ronakbîrên Amedê xebatek baş didomînin.

Di hêla weşanên çandî edebî de jî li Amedê xebatek berbiçav têt kirin. Li Amedê piştê salên 1990î kar û xebata kulturî hîn zêde bû. Dezgehên kulturî hatin vekirin. Weşanên kulturî hatin weşandin û şano hatin li darxistin.

Merkeza Kulturî a Dicle û MÇM, DÎSED û MED - KOM li Amedê kar û xebata kulturî bi tundî dimeşînin. Di hêla weşanên çandî, edebî de pêngavek nûh hate avêtin û kovara AMÎDA dest bi weşana xwe kir. Kovara AMÎDA ji alî komek rewşenbîrên Kurd ve têt weşandin. Ronakbîrên demokrat, pêşverû û welatparêz, Veysel Öngüren, M. Alî Vural, Ramazan Çeçen, Savaş Ezgî, Huseyîn Elçî û Ahmed Kaymak mil dane milê hev û vê kovara hêja AMÎDA'yê diweşînin.

Kovara AMÎDA bi fermî ji alî "Komeleya edebîyatvan û hunervanan" ve têt derxistin. Kovar kovarek mehane ye. Hetanî niha du hejmarên wê derketine. Kovara AMÎDA ji Amedê merhebayek germ dide xwendevanan.




Kovara HELWEST weşana vê kovarê pîroz dike û jê re jiyanek dirêj dixwaze. Bi hêviya ku kovarên weha li Amedê hîn zêde bibin, geş bibin û ji bo pêşveçûna kar û xebata kulturî gavên berbipêş bavêjin.

www.arsivakurdi.org

HELWEST
Kovara Kulturî û Lîteraturî
Hejmar / No: 10 — Sal / Year - Bihar - 1998

## ROMANEKE NÛ

KEWA MARÎ

*Rorama Rêveçûna Li Pey Evînê*

Temaya romanê li ser bêrîkirin, evîndarî, hesreta hevûdu dîtinê hatiye hunandin. "Tecawiz" jî di têde, bûyerên ku têne serê lehanga romanê (keça Kurd Marî) di jiyanê de tên û hatine serê gelek keç û jinên Kurdan. Marî keçikek rewşenbîr e, entelektuel e. Rojnamevanî dike. Lê gelek tiştên ecêp têne serê wê. Di bajaran de "eşkîyayên bajarî", di çiyan de "tîmên taybetî" ecêp tînine serê wê.

KEWA MARÎ

# KEWA MARÎ

## ROMAN

Lokman Polat

Derdikeve !

Bixwînin! Bidin Xwendin

Weşanên Çanda Nûjen

Helwest = ISSN - 1400 - 9404

HELWEST
Kovara Kulturî û Lîteraturî
Hejmar / No: 10 — Sal / Year - Bihar - 1998

FOLKLOR



ZARGOTIN

# FOLKLOR Û ZARGOTINA KURDAN

Derdikeve !

Bixwînin! Bidin Xwendin

Weşanên Çanda Nûjen

Helwest = ISSN - 1400 - 9404

Analîz # Kultur # Lîteratur - Helwest - Bihar - 1998

www.arsivakurd.org